


Mebûsê CHP'ê
Algan Hacaloğlu

cerdevanî wekî karekî
bêrûmet bi nav kir, dax-
uyand ku li gorî gotina
waliyekî ji sedî 95'ê tîmên
taybet faşîst in. Ew li ser
MGK'ê sekînî û eşkere kir ku
gava sivil nikarin tiştêkî
bikin, wekî berpirs MGK'ê
nişan didin û ji berpirsiyê
xwe xelas dikin. Wezîrê
Dewletê yê ji Mafên Mirovan
Berpîrs ê berê Algan
Hacaloğlu li ser komara tirk
û dîroka CHP'ê jî hin tesbî
kirin. Wî xwest ku rayedarên
tirk dev ji
"netewe-dewletiyê" berdîn,
"pir-rengî û pirdengiyê"
bipejirînin.

Rûpel 3



Parlamentere CHP'ê
Algan Hacaloğlu:

OLIVE EM AÇEV JI
NETEWE-DEWLETIYE
BERDİN

- FAYSAL DAĞLI **vê heftayê jî lêkolîna xwe ya bi sernavê "Welatparêzê bê tirs Remzî û Operasyona Mamût"** didomîne Rûpel 8-9
- ROBÎN REWŞEN **bi gotara xwe "Dewleta çetî û rojevê sextey"** qewmînên dawî dinirxîne Rûpel 15
- **Nirxandina DÜZGÜN DENİZ li ser filmê Ken Loch Ajandaya Veşarî** Rûpel 11
- DILBIXWÎN DARA **Li ser Kobanê dîtinên Jan Dost rexne dike** Rûpel 13

NAVEROK



4

Zana Farqînî: Stranên zarokan



6

Cemal Özdemir: Nameyek ji dayika min û ji dayikên şehîdan re



7

Memed Drewş: Çimdê jêw kemalîst de tariqat û mezhebî

Ji Xwendevanan

ÎRO, berhemên me yên edebî bi bijangên çavan, bi xwîna keç û xortan li ser lat û pelên daran tîn nivisandin. Çawa ku çem bi herikandina xwe re gemara di erxên xwe de paqij dike; çawa ku tîrêjên tavê hemû mikrobên nexweşiyê dikujin; çawa ku he-wa dil û cegerê mirov dide xebitandin û jiyana kirin; çawa ku bi hebûna ronahiyê re tarîti ji holê tê rakirin, wisa ji ramanê Serokê Neteweyî bi 27 sermawêzê re gemara di mêjiyê kurdan de da paqijkirin, bi bilindbûna xwe re pênuş dane xebitandin û bi nebûna xwe ji zîlmat û tarîtiya di rih û mêjiyên rewşenbîran de da hilweşandin.

Belê, bi xwîna rojnameyên me tene wê sandin; bi xwîna Mazlûman, Ferhatan, Ayselana, Nazîman û çinarê nemir Musa Anter tene çapkîrîn û belavkirin, divê em hay ji vê yekê hebûn û li gorî wê hereket bikin.

NESRULLAH KURAN-ÇETIN ARKAŞ

DI sala nû de jî gelê kurd li dût tevgera azadiyê ber bi azadiyê ve dimeşe, ji bo me tiştên pêwîst agahiyên li ser tevgera azadî û rewşa gelê kurd in. Tevgera azadiyê çi kir, ewê çi bike û wê tewra gel çawa be? Ji ber ku ew zarokên gulistanê ne, divê ew di rojnameyê de cihê yekemîn bigirin. Divê ji bo me rojeva Tirkîyeyê nebe mijara bingehîn.

Lê, ev nayê wê wateyê, ku em li ser rojeva komara tirk nesekin. Rojeva komara tirk çiqas, hetanî ku derê û bi çî awayî li hesabê tevgera azadî tê, çiqas tevgera me bi pêş dixê, divê rojeva rojnameyê girêdayî van mijarên bê diyarkirin. Ji ber ku hevî-darbûn û serkeftin girêdayî tevgera azadî ye.

BADÎN POLAT



Tîrêjên rojê qeşayê dihelîn

SAMÎ TAN

Hefteya çûyî hin bûyerên girîng qewimîn, bi van bûyeran re, têkiliyên rayedarên tirk ên bi hêzên tarî re zêdetir zelal û ronak dibin. Bo nimûne dadgeheke almanî da zanîn ku, ji îfadeya şahid û bersûcên dozeke narkotîk, hatiye fêmkirin ku Tansu Çiller bazirganên madeyên narkotîkê diparêze.

Li ser vê bûyerê Sernivîskarê Hürriyetê Oktay Ekşi û Gerînendeyê Weşanê yê Hürriyetê Ertuğrul Özkök şiroveyên balkêş dikin. Li gorî Özkök û Ekşi, gotinên dadgerê mehkemeyê ne bêbin-yad in. Ertuğrul Özkök dide zanîn ku navê Tirkîyeyê tevî dewletên terorîst û bazirganê narkotîkê tê bilêvkirin. Li aliyê din nivîskarê rojnameya Radikalê İsmet Berkan diyar dike ku dewletên Ew-rûpayê bi eynî çavî li Tirkîyeyê dinihêrin.

Dîsa pîreka Abdullah Çatlı bi awayekî zelal diyar kir ku, mêrê wê jî bo dewletê xebitîye, ji aliyê dewleta tirk ve jî, li Swîsreyê jî girtîgehê hatiye revandin. Meral Çatlı gefek pasaport jî wekî belge pêşkêşî Komîsyona Susurlukê ya Meclîsa Tirk da.

Her wiha rojnameya Radikalê wêneyê daweta suneîta kurên Ayhan Çarkın û Ziya Bandırmalıoğlu weşandin. Ji van wêneyan tê fêmkirin ku Cîgirê Se-

rokê Şaxa Harekata Taybet İbrahim Şahin û Abdullah Çatlı digel hev, kirivatiya kurên van her du tîmên taybet kirine.

Bûyerên ku rûyê dewleta tirk eşkere dikin, bi ev qasî namînin, Serokê Partiya Karkeran Doğu Perinçek roja 18'ê mehê civîneke çapemeniyê li dar xist, Perinçek digel îtfirafên hin "ülküçü" yên berê da zanîn ku, partiya faşîst MHP'ê li dora bendava Ömerliya Stenbolê kampek saz kiriye. Gotinên ülküçüyên berê, yên der barê kuştina Mehmet Sincar de balkêş in. Ew dibêje yekî bi navê Abdurrahman Alsaral piştî kuştina Sincar telefonî rojnameya Hürriyetê kiriye û li ser navê TIT'ê (Türk İntikam Tugayı/ Tuxaya Tolhildanê ya Tirkan) berpîrsiya kuştinê girtiye ser xwe, paşê jî telefonî emniyetê kiriye û gotiye, "Me Sincar li ser navê TIT'ê kuşt". Li ser gotina polîs a bi rengê "destê we ter û şîn bin beranên me", ew jî polîs re çêran dike, dibêje, "Desiktir be, we ew kuşt."

Rayedarên tirk bi alîkariya çapemeniyê, perdeya şovenîzmê kişandiye ser çavên gelê tirk, lê dinya rewşê dibîne. Li aliyê din gel jî hêdî hêdî bi ser xwe ve tê. Hêzên aşîxwaz zêdetir dibin û dengê xwe bilind dikin.

Ne tenê kedkarên tirk, karsaz jî ji

rewşê nerazîbûna xwe diyar dikin. Wekî mînak roja 20'ê mehê Serokê Komeleya Karsaz û Pişesazên Tirk (TÜSİAD) Halis Komîli raporeke ku wê komeleyê amade kiribû, pêşkêşî Serokê TBMM'yê Mustafa Kalemlî kir. Ji vê raporê jî tê ditîn ku, karsazên tirk angosermayedarên tirk di warê siyasî de hin guherînan dixwazin. Di gel daxwazên wekî rakirina MGK'ê, bisinorkirina rayeya artêşê û hin daxwazên li ser dibistanên îmam-hatîbê, li ser kêşaya kurdî jî hin xal hene.

Rakirina qedexeya li ser çanda kurdî û avakirina partiyên li ser navê kurdan di vê roparê de cih digirin. Her wiha di warê demokratîkbûnê de jî, ji bo ku rê li ber îşkenceyê bê girtin hin daxwaz hene. Dîsa di warê azadiya derbirina bîr û bawariyan de jî, rakirina xala 8'an a qanûna li dijî terorê tê xwestin.

Gelek rewşenbîr û nivîskarên tirk piştigiriya xwe ji bo raporê nişan dan. Ji partiyên di parlamentoyê de bi tenê ANAP'ê bi awayekî şermokî piştigiriya raporê kir. Lê partiyên li derveyî parlamentoyê wekî HADEP, ÖDP, BP, YDH'ê piştevaniya raporê kirin. Nivîskar Ahmet Altan xwest ku eniyêke dijber li derveyî parlamentoyê bê avakirin.

Wekî encam mirov dikare bibêje ku, sistêmê jî ber şerê qirêjî xitimiyê, her kes tê digihîje ku bi vî awayî kar nameşe, lê îdeolojiya fermî rênade guherînan bingehîn. Li civaka tirk di bin îdeolojiya kemalîzmê de qeşa girtiye. Bes tevgera azadiyê wekî tîrêja rojê wê qeşayê dihelîne.

Jiyana giran û bi rûmet

NEZÎR DOREHÎ

Jiyana li her derî jiyana e. Lê li hindê erdan giran, li hindê erdan pir sivik e. Li hindê erdan pariyek nan, taseke av, li hindê erdan her tişt e.

Jiyana kurdan... Jiyana wan heta salên 1984-85'an pariyek nan, tasek av, jinanîn, birakujî, şivanî, hevûdin xapandin bû. Lê niha? Jiyana her tişt e. Jiyana şer e, şerê aşîyê, şerê biratiyê, şerê azadiyê ye. Ji ber vê jî giyana kurdan gelek giran e. Li bin agirbaranên bala-fîran, şewitandina gundan, guledana çiyana, bajaran, geliyan; kuştina mirovan, ya heywanan; girtina dayik, bira û hevalan... û hwd.

Hûn! Ên ku xwe axa, şêx û dewlemend dihesibînin. Hûn dibêjin ku jiyana we gelek xweş e. Ka jiyana we? Ka serbestî û welatparêziya we? Bi zimanê dijmin axaftin, bi çeka wî mirov kuştin, bi çavên wî ditîn, bi guhên wî bihîstin, ne jiyana e.

Hûn keriyê pezê xwe dibin zozanan

Hûn! Ên ku xwe axa, şêx, dewlemend dihesibînin. Hûn dibêjin ku jiyana me gelek xweş e. Ka jiyana we? Ka serbestî û welatparêziya we?! Bi zimanê dijmin axaftin, bi çeka wî mirov kuştin, bi çavên wî ditîn, bi guhên wî bihîstin, ne jiyana e.

diçêrînin. Bi siheftî hûn pariyek nan dixwin, Ma ev e jiyana? Hey ew jiyana bi serê we de bê! Xwelîserîno!

Her ro birayên we li çiyana, li ber wê sir û seqemê jî bo azadiya gelê xwe bila şer bikin, bînan kuştin, bimînin birçî, bila her ro dayikên we li deriyê girtîgehê bînan kutan, bînan bê sefûberkirin, bila her ro gundêr we bînan valakirin, çiyayên we bînan bombekirin, daristanên we bînan şewitandin, bi kurtî jiyana li gelê kurd bête qedexekirin, hûn hêj hevalê dijmin, neyarê gelê xwe bin. Ka jiyana û namûsa we?

Ma çî ye jî bo wê namûsê jî naylinga pê ve? Hûn dibêjin marê ku bi min venedê bila hezar sala bijî. Hey xwelîserîno. Marê ku bi te venedê, bi birayê te, bi dayika te, bi xwişka te, wê bi gelê te vede.

Niha nan bi destê te nakeve, av di

gewriya te de naçe, şivanî û zozan jî destê we çûn. Ji birakujî, xayîntî û bênamûsiyê pêvetir çî maye di destê we de?! Ji ber wê jî jiyana we pir sivik e.

Û li jiyana gelê xwe, welatê xwe mêze bike. Ji rûniştinê heta rabûnê, ji rêveçûnê heta axaftinê.. Li jiyana gelê xwe mêze bike. Jiyana wan gelek giran e. Jiyana li serê çiyana, li girtîgehê, jiyana dayikan, kalan, zarokan, xortan pir giran e. Di jiyana wan de xapandin, bînamûsî, hevûdin firotin nîn e.

Di jiyana wan de biratî, wekhevî, welatparêzî, namûs, welat, berxwedan heye. Jiyana wan giran e, lê jiyaneke bişeref e.

Hûn jî vegezin wê jiyana. Dest baivên jiyaneke nû, dest baivên jiyana gelê kurd, dest baivên jiyana rêbertiyê û dest baivên biratiyê, aşîyê, azadiyê.



DADGEHA Eyaleta Frankfurt ya Almaniyê roja 20'ê rêbendanê da zanîn ku Wezîra Karê Derve ya Tirkîyê Tansu Çiller bazirganên madeyên narkotik diparêze. Dadgare mehkemeyê di encama dozê ku du tirk û yekî îtalî bi cezayên giran hatin cezakirin de, diyar ku dewleta tirk şebekeyên ku wî karî dikin, diparêzin.

Dadger Rolf Schwalbe li ser pîrsa rojnamevanekî navê Tansu Çillerê da. Dewleta tirk Almanya protesto kir, lê rayedarên alman dan zarfîn ku li welatê wan dadgeh serbixwe ne û dewlet nikare lê tesîrê bike.




HEWLÊN rayedarên tirk ên ji bo valakirina Kampa Etrûşê bi ser neketin. Piştî ku Komîseriya Billind a Penaberan a Neteweyên Yekbûyî (UNHCR) ji kampê vekîşt, gel dev ji cihê xwe berneda û li cihê xwe ma. Li gorî nûçeyê ku roja 23'yê mehê di rojnameya Milli-yetê de derket, gel li dijî mudehalaya dewleta tirk amadehiyê dike.

Nûçevanê rojnameyê Namik Durukan dide zanîn ku gel naxwaze vegere Tirkîyê. Ji ber penabaran Cuma Amed dibêje: "Biryara UNHCR'ê bi tesîra Amerika û Tirkîyê çêbûye, li dijî wê biryarê hezar kes derket çiya, em dev ji cihê xwe bernadin."

NÛÇE

Parleментарê CHP'ê
Algan Hacaloğlu:

Divê em dev ji netewe-dewletiyê berdîn



Algan Hacaloğlu

Mebûsê CHP'ê Algan Hacaloğlu cerdevanî wekî karekî bêrûmet bi nav kir, daxuyand ku li gorî gotina waliyekî ji sedî 95'ê tîmên taybet faşîst in. Wezîrê Dewletê yê ji Mafên Mirovan Berpirsê berê Hacaloğlu li ser komara tirk û dîroka CHP'ê jî hin tesbît kirin. Wî xwest ku rayedarên tirk dev ji "netewe-dewletiyê" berdîn, "pîr-rengî û pirdengiyê" bipejîrînin.

kes demediket serê çîyan."

Hacaloğlu li ser MGK'ê hin tiştên balkêş gotin. Li gorî dîtina wî, sivil gava ku nikarin tiştê bikin wekî berpirs MGK'ê nişan didin û ji berpirsiyê xwe xelas dikin.

Mebûsê CHP'ê Hacaloğlu da zanîn ku sedema gelek probleman ekonomîya rantîye ye. Hacaloğlu cerdevanî wekî karekî bêrûmet bi nav kir, daxuyand ku li gorî gotina waliyekî ji sedî 95'ê tîmên taybet faşîst in. Wezîrê Dewletê yê ji Mafên Mirovan Berpirsê yê berê Hacaloğlu li ser vê mijarê serpêhatiyeke xwe jî vegot. Li gorî gotina wî li Kurdistanê hin tîman îşareta MHP'ê kirine, li ser vê yekê polîsekî gotiye: "Ev jî hevalên me ne ku armanca jiyana xwe wînda kirine."

Algan Hacaloğlu li ser komara tirk û dîroka CHP'ê hin tesbît kirin. Wî xwest ku rayedarên tirk dev ji "netewe-dewletiyê" berdîn, "pîr-rengî û pirdengiyê" bipejîrînin.

Karsazan jî demokrasi xwest

Dîsa di 20'ê rêbendanê de Serokê TÛSIAD'ê Halîs Komîlî raporek pêşkêşî Serokê TBBM'ê Mustafa Kalemli kir. Rapora bi navê "Bilînkirina Standartên Demokratîk" jî aliyê Prof. Bülent Tanör ve hatiye amadekirin.

Di raporê de, rakirina MGK'ê, girêdayina serkaniya artêşê bi wezaretê berrevaniyê ve, ji aliyê gel ve hîlbijartina serkomar, destûrdayîna pêşketina zîmanê kurdî, weşanên bi kurdî û partiyên li ser navê kurdan, rakirina xala 8'an ya qanûna li dijî terorê, kurtkirina dema binçavîyê, berbendkirina îşkenceyê û rakirina îdamê tê pêşniyaz kirin.

Rapora TÛSIAD'ê wekî bersiva Rapora MGK'ê hat nîrxandin. Hinek nivîskar û rojnamevanên wekî Gülay Göktürkê dan zarfîn ku çîna sermayedar a Tirkîyê di dinyayê global de dixwaze bi sermayedarên navnetewî re hevkarîyê bike û bazarên xwe yê hundirîn û derveyî dorfirehtir bike. Dîsa Ahmet Altan diyar ku partiyên di meclîsê de tirk çînen hilberîner (karker, gundî û karsaz) temsîl nakin. Altan got ku divê berevêke dijber li derveyî parlamentoyê bê afirandin.

Her wiha rûdaneke ku ji bala raya giştî dîr maye, sedema pêşkêşkirina rapora TÛSIAD'ê ronîdar û zelaltir dike. Di çapemeniya tirk de hat daxuyandin ku, bûyera Susurlukê ketiye rojava Ewropa û Amerîkayê jî.

Rûdaneke girîngtir jî ev e: Dî meha pûşperê (heziran) de, Yekîtiya Ewropayê listeya welatên ku wê di diwarojeke nêzik de karibin bihin endamê yekîtiyê, diyar dike. Li gorî nîrxandinan, TÛSIAD bi vê raporê îşaretê dide Ewropayê. Her wisa, ew dixwaze bi vê raporê xwe li derveyî qirêjîyan bide nişan bide û şerkêşîya têkoşîna "civaka paqij" bike.

Raporê bi qasî piştgiriyê, rîka hin kesên jî kişand ser xwe. Bo nimûne Cîgirê Seroka DYP'ê Yalhm Erez di daxuyaniya xwe ya ji bo BBC 'yê de diyar kir ku, rapor jî aliyên kesên 'entel' ve hatiye amadekirin û jî rastiyên Tirkîyê dîr e. Dîsa ji DYP'ê Çoşkun Kırca hê berî ku raporê eşkere bike, di quncikê xwe yê di rojnameya Yüzyıldê de dest bi nivîseke li dijî zîmanê kurdî kir.

Serkanê Artêşa Tirk İ. Hakkı Karada-yî û derûdorên leşkerî li hemberî raporê reaksiyoneke tûj nişan dan. Wan raporê wekî "qehremantiyeke erzan a siyasî,



Sedat Yurtdaş

nepewîst û ne li cih" nîrxand.

Ji aliyê dînan ve hin partî û sazî bi erêdaneke sergirtî der barê raporê de dîtinên xwe tînin zîmên. Mesut Yılmaz di bernameyê televizyonê de diyar kir ku pîrsigirêka kurd bi metodên leşkerî nayê çareser kirin. Serokê TBBM'ê Mustafa Kalemli jî da zanîn ku ewê raporê wekî pêşnûmayê qanûnê pêşkêşî meclîsê bike.

Rapora TÛSIAD'ê nakokîyan dide der

Me li ser rûdanên dawî dîtinên Cîgirê Serokê Giştî yê HADEP'ê Sedat Yurtdaş girtin.

Cîgirê Serokê HADEP'ê Sedat Yurtdaş li ser rapora TÛSIAD'ê jî nîrxandinek kir û daxuyand ku rapor nakokiyên di navbera aşîxwaz û şerxwazan dide der. Wî got: "Bi rapora MGK'ê diyar bû ku der û dorên leşkerî dixwazin pîrsigirêka kurd bi metodên kevî çareser bikin." Yurtdaş bal kişand ser du meylan. Wî got: "Li aliyê yê ku dixwazin civakê bi îdeolojiya fermî idare bikin, li aliyê dînan jî yê ku dixwazin pîrsigirêka kurd li gorî rastiyên îro çareser bikin."

EŞREF SİDAR

Stranên zarokan

Gava dayik (an jî kesên din) bi pitik û dergûşên xwe şad dibin, stranên jî ji wan re dibêjin. Lê ev stran ne bi awayekî adetî ne. Bi rastî ne tam wekî stranên tene strîn û ne jî tam mîna helbestan tene xwendin. Bi awazeke wisa tene gotin ku dişibe muzîka rapê. An jî bi gotineke din, bi regekî ku di navbera stran û helbestê de ye, tene strîn. Dikare bê gotin ku tene xwendin....

Taybetiyeke din jî di van stranên de dêhna mirov dikişîne ku hem ne xwediyên rêzên hevgerî ne û hem jî her rêzek xwediyê hejmarek kîteyan (heceyan) e. Yanê yeksaniyek di navbera rêz û kîteyan de nîn e.

Ji bo van yekan em nimûneyan pêşkêş bikin:

Serê wî bişon, cilên wî lê kin

Keç çûne kêfê, bi wan ra verê kin

Rêza pêşîn deh (10) kîte ye û ya duduyan jî yazdeh (11) kîte ye. Bi kurtî kîte hev nagirin. Her wiha stran du rêz e, yanê malikek e.

Qurban bim, bi kî va

Tilî Begê Silîva

Hacî Axayê Milîva

Emê ji te re bikin kirîva

Em kîteyên vê stranê jî bidin xuyakirin. Rêza pêşîn şeş (6), ya duduyan heft (7), ya sisyay heşt (8) û ya çaran jî deh (10) kîte ye. Di vê de jî kîteyên her rêzê cuda ye û hev nagirin. Li aliyê din, wekî ku tê dîtin, ev strana hanê jî, ji çar rêzan hatiye pê.

Digel van taybetiyan, taybetiyeke din jî derdikeve pêşberî me. Taybetiya helbesta serbest î kêşsaz (wezn û qafiyê).

Ji ber ku mebesta me ji vê nivîsê destnîşankirina stranên zarokan e, em dê li ser naverok, şêwe û çawanîya wan nesekin. Tenê, daxwaza me ew e ku em çend nimûneyên van stranên pêşkêşî we xwendevanên heja bikin.

Ji aliyê din ve, em pêwîst dibînin ku em hin agahiyên bidin. Me ev stran jî hêrêma Farqînê berhev kirin. Me destê xwe bi tu awayî neda eslên wan. Çawa me ew ji çavkaniyan girtibe, me wisa jî ew tomar (qeyd) kirine.

Em li ser xaleke din jî rawestin. Em bêhtir rastî stranên ji bo zarokên kurînan hatin, ligel hewlan me kêr stranên ji bo zarokên qîzînan bi dest xistin. Ji ber van tecrûbeyên em dikarin eşkere bikin ku civaka me di wî warî de jî ferq û meyl kirîye navbera pitikên kurînan û keçînan...

Em dê jî, berevajiyê civaka xwe pêşî dorê bidine stranên ji bo zarokên keçînan.

Stranên ji bo zarokên qîzînan

Li kê çûye, li kê çûye

Li Xatûna Xato çûye

Zirka û Silîva li ser pev çûye

Sêrdin Paşa li ber rabûye

Mihemed Begê fermanlî ye

Esker li ser mehf bûye

Koçer li ser talan bûye

Ez bi qurban bim dest bi bazin e



*Bûka apê mezin e
Apê biçûk kir gazin e
Got, çima nebûye ya min e*

*Lê qîzê mêr ezîzê
Teniya dîzê*

*Lê qîzê
Rûnêşê ji teniya dîzê*

*Tilî Begê Silîva
Hacî Axayê Milîva
Emê ji te re bikin kirîva*

*Qurban qurban qurbanlix
Esker axa selamlîx
Deşta Mûşê çîmanlix
Xinamî ji me dixwazin
Beşbînlik û gerdanlix*

Ev stranên zarokan ne bi awayekî adetî ne. Bi rastî ne tam wekî stranên tene strîn û ne jî tam mîna helbestan tene xwendin. Bi awazeke wisa tene gotin ku dişibe muzîka rapê. An jî bi gotineke din, bi regekî ku di navbera stran û helbestê de ye, tene strîn. Dikare bê gotin ku tene xwendin jî...

Ka qewlê par payîzê

Stranên ji bo zarokên kurînan

*Serê wî bişon, cilên wî lê kin
Keç çûne kêfê, bi wan ra verê kin*

*Lor lo kurik lor lo kurik
Neçe pêşiya keçên serbişirik
Agir birdin xanî, dûrî rihan
Me bikne qirik*

*Lo kuro lor lo kuro
Derî veke were hindiro
Bazinê xiromiro
Min te nedî îro duro*

*Ez bi qurbana te kurî
Dê keçel, bav gurî
Sala xelaya mezin
Te bi elbîkî gilgilê sor kirî*

Qurban bim bi kî va

*Xweda Xweda te bihişt
Mîr li meleka dahîşt
Li quncê odê rûnişt
Û te bikira mezinê gişt*

*Çima çima
Te çilo çîmî tevî pelçima
Qizîkê xelkê lê bûn tima*

*Xwezil bibûya zivistan
Lawika li tembûrê xista
Keçika dolav birista*

*Ew kî ye, kî ye
Lawikê xî ye
Bi kiras û bi derpî ye*

*Xweda Xweda mal ava
Ji xelkê bûk, ji me zava*

*Qurban qurban ji ku tê
Hespê wî dike pêkutê
Mêvan e ji mala xalê xwe tê.*

*..... tek e
Xalik me ji te kir dîlek e
Tişkî pê meke*

*.... tê ji mala xala
Nerije çavê jinxala
Çawa berîka min vala.*

*Dayê qurbana vî serî
Mirtiv hatin ber derî
Defê kirin şeş kerî
Xatûn geştê me werî*

*Ez .baş im, baş im
Ez hem dîng im hem aş im
Ez tîtûn im, ne kamaş im
Li cihên bi xal (niqte) navek tê danîn
û wisa stran tê gotin. Ji bo nimûne em navê "Ronî" li cihên xalan deynin:*

*Ronî tê ji mala xala
Nerije çavê jinxala
Çawa berîka Roniyê min vala*

Çaxa ku zarok di xew re dikin jî stran distrên. Ji bo vê yekê jî mînakek:

*aaaa..... a kin
Gazî şêx û mela kin
Gazî bavê kura kin
Gazî diya qîza kin
Wan di axurê keran kin
Halê wan bi halê sa kin
Qîza li xorta mehr kin.*

Belê, gava serê pitek/ê jî tê şuştin, hin tişt tene gotin, em jê re jî bibêjin stran. Mînakek jî, ji vê kirina hanê re:

*Hesen û Huseyn li berşoyê
Serê wan dişon bi ava royê
Serê xwe bişon
Bi ava û arava wan
Li cihê ku vala maye, navê pitikê an jî pitikê tê bilêvkirin.*

Piştî ku şuştin diqede, îcar ev gotinên li jêrê tene gotin:

*Avikê berjêr
Keçikê (kuriko) berjor
avê lê kin, avê lê kin
avikê lîs, lîs lîs lîs...*

Me ji bo serşuştin, dixewrekin û şadbûnê nimûne dan, divê em ji bo "tirsandina zarokan" çend heban pêşkêş bikin. Çimkî ji bo vê yekê jî hene:

*Heleşin meleşin
Were wan di kulekê de bikşin*

*Teptep dikim
Reprep dikim
Xwelî li qafê
Bavê gur dikim.*

Em nimûneyan ji bo rewşa bînjînê (pişkînê) jî bidin û li dawîya nivîsa xwe xalekê deynin:

*Her bijî
Carek din jî
Xwedê bide emr û jî
Bi dê û bav bijî*

*Xêr bijî
Xêrxwazan malik tijî
Xêrnexwazan çavik birjî*

ZANA FARQÎNÎ

Çi ji welêt xweştir e?

Gelo çî ji welêt xweştir e? Xaniyekî li ber perê behrê, erebeyeke mercedes û gera dinyayê, jin û zarokên xweşik û delal, erd û zeviyan ku ne serî diyar e û ne dawî, fermandariya kargehan? Tendirustî û dewlemendiya malên dinyayê, cilên xweşik, qonderiyên pir biha û evîndarî? Dibistan, daristan, çem, derya, çiya, gol, gelî, newal, xwarin; hingiv, gezo, goşt, mey, kêfa ser kelayekê, gemî, teyare, tanq, top?..

Çî xweş e ne were? Çî xweş e ku ev tişt ên mirov bin û di destê mirov de bin.

Lê na, weleh ne yek jî bêyî welat nabe. Ku welatekî mirov î serbixwe tune be, ku mirov bi serbestî bi zimanê dayika xwe nepeyive, ku mirov bi ser bilindî nebêje "Ez kurd im, an tirk im, an ereb im" ku cilên xelkê, yê biyanan li mirov bin, ku mirov ji bo biyanan kar bike, ku mirov bi keştî (gemî) û trimpêlên biyanan bigere, ku mirov bi darê zorê û wekî biyanan, ji evîndara xwe re helbestan binivîsîne, ku mirov strana hezar salan têxe bin erdê û bi zimanê biyanan bistirê...

Gelo wiha dibê? Gelo wê demê mirov dikare ji xwe re bibêje ez mirov

Zimanê min, wekî ku min ew hîn kiriye, digere di devê min de. Lêvên min wekî ku min ew hîn kiriye, dibêje: "W!" Qirika min jî wekî hîn bûye dengê "X" û "Q"yê jê derdikeve. Qirika min, zimanê min û lêvên min wiha hîn bûne û dibêjin: "Bavo, yadê, welat, ax û qeder.." Çiqas xweş li hev û din dikin lêvên min, zimanê min û qirika min. Qet gengeşî di nava wan de çênabe.

im? Mirovên kurd bi hêsanî dikarin bibêjin em kurd in?

Na...! Heke digel pêkûtiya hezar salan jî dayika min zimanê xwe parastibe û bi hezaran hetikatiyê ez hînî zimanê xwe kiribim û ez nikaribim bibêjim, "Ev zimanê dayika min e, ezê pê bipeyivim, pê bi bixwînim, binivîsînim" wê demê kêmasiyek di mirovatiya min de heye.

Heke bi hezar salan ji bo vê axê, bi milyonan kes miribin û bi milyonan pêkûti dibin û dîsa ji vê axê re gotibin, "Ya min e" û ez jî rabim bibêjim, "Mal û milkên dinyayê ji welat xweştir e." Ev kêmasiyekê pir mezin e di mirovatiya min de.

Zimanê min, wekî ku ez hîn, digere di devê min de. Lêvên min wekî ku ew hîn bûye, dibêje: "W!" Qirika min jî wekî hîn bûye dengê "X" û "Q"yê jê derdikeve. Qirika min, zimanê min û

lêvên min wiha hîn bûne û dibêjin: "Bavo, yadê, welat, ax û qeder.." Çiqas xweş li hev û din dikin lêvên min, zimanê min û qirika min. Qet gengeşî di nava wan de çênabe.

Lê mixabin hinek têne ji min re dibêjin, "Divê zimanê te wiha negere, qirika te nebêje "x", bibêje "g", divê tu nebêji "q", bibêje "ka", dibêjin:

"Lêvên te jî divê nebêjin "w", bibêje "v."

Ez dibêjim: "Çima? Ma çî zirara wê heye?" Dibêjin: "Na, pir zirara wê heye. Heke "q" ji devê te derkeve, wê mirovên me giş biqelîhin, heta û heta heta wê mirovên dinyayê giş biqelîhin. Heke tu bibêji "x" û nebêji, "ka" wê ev axa ku em li ser dijîn parçe bibe.

Belê hevalino... Ev dibêjin: "Divê zimanê te wekî yê min bigere, divê qirika te wekî ya min deng jê bê."

Dibêjin: "Divê tiştên di hişê min de

derbas dibin, di hişê te de jî derbas bibin." Dibêjin: "Ku min ji çî hez kir, divê tu jî jê hez bikî, ev cil û bedlên ku ez li xwe dikim, divê tu jî li xwe bikî, ez çawa kêfê dikim, çawa dikenim, çawa dileyîzim divê tu jî wisa bileyîzî. Heke tu wekî min nekî ez mafê jiyane ji te re nahêlim."

Û dîsa dibêjin: "Heke tu bi zeybek nelîzî û tu bi delîlo bileyîzî, ezê dinyayê bihejînim. Heke tu kutilkan bixwî û mantiyê nexwî, heke tu şal û şapik li xwe bikî û tu fotr û smokîn li xwe nekî ezê qubeya asîman li ser serê te bînim xwarê."

Îcar ew ji xwe re wiha dibêjin. Lê divê em çî bikin? Pêwist e ji bo ku xewna hezar salan bê cih, ku çiqas deng û awaza me heye em bibêjin, "Qeeeeeeeeee...!" û em bibêjin, "Xeeeeee...!", em bibêjin "Weeeee...!" û bi van tîpan em bibêjin: "Welaaaaaat...!", "Axa meeeee...!" Û em bibêjin: "Qedeeeeer...!"

Bila bi awazên me kevir û zinar hilweşin, çem û kanî bimiçiqin, erd biqelişe, ta em axa xwe bistînin, heta ku em welatê xwe rizgar bikin û em qedera xwe têxine destên xwe.

ÇIYA MAZÎ

Çavên Etrûş

FAYSAL DAĞLI



Barana avrêlê hûr hûr dipeşkiya. Erd şil, giya şîn bûn. Zevî, wek deryayekê kesk û bêbinî cih cih bi kulîlk û bi nêrgizan xemilandî bû. Bayekî sivik ji rojava dihat û girên ser tixûb didan ber xwe. Wekî senfoniyeke mirinê bi dengê kûr û ziwa, ji guhên mirov derbas dikir û wekî xebereke ne xweş di mejiyên de deng vedida.

Pişkên baranê wekî pepûleyan li ber bayê rojava virde wîrde dihêvîrîn. Komên çivikan wekî ku bi pişkên baranê bileyîzin li asîmanan difiriyên, heta ku ji çav wînda bibin bilind dibûn û careke din wekî ku hişên xwe wînda kiribin berê xwe didan pozên lûtkeyên çiyayan. Hinek ji wan, bi wê hêzê li keviran diketin û ji erdê ranedibûn.

Car caran tîrêjên rojê, ewrên reş qul dikirin û wekî hêviyê çavan, ronî dikirin. Serê çiyayên der û dora tixûb spî bûn. Berfê wekî boyaxekê spî lûtkeyên xencerî xemilandibûn. Ew lûtke wekî xezeba Yezdan paqij bûn. Wekî gaziya belengazan şîr bûn û wekî keserên wan, berê xwe dabûn rojê.

Sala 1991'ê bû. Ji demsala bihar, ji meha avrêlê bû. Kurdistana Başûr serî hildabû. Piştî salan, careke din alaya zebaniyan ji zeviyan xwe avêtibûn. Behdînan û Soran heta quncikên dawîn, Hewlêr û Silêmanî heta kolanên sêwî rizgar bûbûn. Lê pir najotîbû wê wûs-

latê. Artêşa mirinê bi balafir û çekên kîmyewî careke din êrîşî ser Kurdistanê kiribû. Fermana Drakûlayê xwînxwar Saddam hebû, ên ku di nava cilên kurdan de bin, pêwist bû bihatana kuştin. Mirin wek tofaneke lanetê Kurdistan dabû ber xwe.

Xêza ku dagirkeran di nav Botan û Behdînan de kişandibûn, seranser ji aliyê komên nêçîrvanên hêviyê ve hatibûn pelçikandin. Dayik û bavên tevî ezîzên xwe, tevî sitlên dilên xwe, zarokên xwe li tixûban qelibûn. Birçî û tî bûn, tazî û bêxew bûn, nexweş û bêçare bûn. Li benda tasek av, gezek nan bûn. Komek ji wan, ji Batûfayê, ji Bamerniyê, ji Şeranişê, ji Derkarê hatibûn. Hinek malbat bi deh kesî bi rê ketibûn, bi sê kesî gihîştibûn cihê ku lê girtibûn. Hinek dayik bi parga derman ketibûn; ji bo birînen fosfor ên ku li canê zarokên wan in, rêçên xerdelê ku li çavên keçên wan in. Gelek dayikan ji bo ku cesedê zarokê xwe yê dawîn nebînin, berî wî xwe kuştin û li bihuştê li rêça zarokên xwe geriyên.

Komek ji wan, bi deh hezaran xwe avêtibûn çiyayên Qilabanê, lê leşkerên Romê dor li wan girtibûn. Tenê em çend roj-namevan, bi lavayan me xwe gihandibû komê. Lê me yê çibikira... Li sînga Çiyayê Qilaban dîmeneke dojhê hebû. Wîcdan ji dilê mirovan bar kiribû. Çend gundiyan der û dorê berê xwe dabûn Yezdan û jê pirsê dikirin: 'Me çî kir ji te?'

Ji bo ku 'mîrov' karibe, li wê dîmenê binêre û li ber xwe bide, ji dêlva dil, pêwist e kevirê bi xwe re bigerîne. Kevir ji bo min giran bû. Ji bo ku hinekî bêhna min derê û ez halê wan nebînim, ez ji wan dûr ketim.

Wekî berxekî ku dayika xwe windakirî be,

bêhiş bû. Wînda bûbû. Nizanibû bi ku ve diçe. Ji komê qetiyabû û bala kesî nekişnadibû. Hêsirên wî û pişkên baranê bi hev re ji çavên wî dihatin xwarê. Hingiya giriya bû, dengê wî ketibû. Di ber xwe de dinaliya û digot:

"Ez diçim bavo, ez diçim malê."

Lawikekî heft, heşt salî bû. Porê wî kin û keş bû. Çavên wî ji hêstiran sor bûbûn. Pêlav di lingên wî de tunebûn. Fanoriyê li ser wî zirav û qirêjî bû. Pijemayekî ziravik û qetandî lê bû. Di bin baranê de şil bû bû. Dirikan lingên wî ji çend cihan birîn kiribûn. Xwîna wî û çamûra sor bi hev re li canê wî ziwa bûbû. Min ew hembêz kir û ceket avêt serê. Serê wî, çavê wî, canê wî paqij kir. Digiriyayî bi awirên xwe yê masûm li min dineriya: "Ez diçim malê, ez diçim bavo."

Bêhna Kurdistanê jê dihat. bêhna êş, xwedan, xwîn û bêkesiyê jê dihat. Piştî ku min ew da ser milên xwe û berê xwe da nav komê, hinek ji giriya, lê hingiya betilîbû, demeke din di xew re çû. Ji bo ku hinekî raze, ez hêdî hêdî dimeşiyam. Piştî ku çav bi wan însanan ket, fêr kir ku nezî diya xwe ye û çavên xwe li ser wan gerand. Di nav me û komê de rêzek leşker hebûn. Nehiştin ku ez bikevim nav komê û li dayika wî bigerim. Min ji nav komê, ji kalekî re rewşa wî got û ew teslîmî wî kalî kir. Kal ew girt milên xwe û soz da min ku, wê dayika wî bibîne.

Dema em ji hev qetiyên, çavên wî yê sor di bîra min de man. Û min tu car ew çav ji bîr nekirin. Min navê wî nizanibû, lê îro ez navê wî lawikê ku di dilê min de veşartiyê datînim Etrûş. Lewre, ez her ku zarokên Etrûşê dibînim, ew tê bîra min.

Nameyek ji dayika min û ji dayikên şehîdan re



Dayê!.. Serê xwe bilind bike, çavên xwe veke û li min guhdar bike. Ez vê nameyê ne ji bo te tenê dinivîsim. Ez vê nameya xwe ji bo hemû dayikên ku wekî te dilên wan tijî xwîné, ku hêstirên çavên wan wekî çem û rûbaran diherikin, ku agir hinavê wan dipertîne, jar û xemgîn dinivîsinim. Ji ber ku ne tu tenê xwediyê vê qedere yî. Yê wekî te û hûn ji ji te xemgintir, jartir û pêtek agir hinavê wan dişewitîne pir in. Xwezî min bikaribûya birînen we derman bikira, xwezî min bikaribûya agirê nava dilê we bitemiranda. Heger hûn baş li min guhdar bikin, hûnê bi xwe bikaribin agirê nava dilê xwe vemirînin û xwîna birîna xwe bisekinin.

Ez di nav xîzantiyê û serfiraziyê de hatim dinê. Rastiyek heye, dibêjin: "Tu tişt ji dilê zarokan paqijtir tune ye." Wextê min nû çavên xwe li rûyê dinê vekirin, dilê min jî pir pakij bû. Min tiştê nedizana. Ez jî wekî her kurdî di nav vê feqîrî û kevneperestiyê de, li gund mezin bûm. Di nav vê sernizmî û serberjêrçûna millet de heya dawî ketibûm. Ji bo ku ez tekane lawikê we bûm, we pir ji min hez dikir, ew qas hezkirina we jî nikarbû pêşiya perçiqandina min bigire. Piştî heft saliya min pê de, ez ketim nava kar. Geh diçûm daran, geh diçûm kolan û merdanê. Ez çiqas bixebitiyama, we ew qas ji min xebat dixwest. We rojekê ji min re behsa miletê min nekir, we dijminê min rojekê bi min neda nasîn û behsa zilm û zordariyê ji min re nekir, kesekî ji we dijminê min bi min neda nasîn û behsa hovîtiya wî ji min re nekir.

Wekî îro tê bîra min, sala 1985'an bû, gundiyeke me hebû, sofî bû, riyê wî bi qasî bihostekê dirêj bû. Lawê sofî çûbû nav hevalan, digotin ku lawê sofî çûye nav APO'ciyan, çûye çiyê, ew jî bûye qaçax. Ev gotinên heanê heya guhê dijmi jî çûn. Rojekê serê sibê, hê tirêjê tavê derneketibû, me dît dora gund leşkerên dijmin girtine. Gundî, tu kes nehiştin, gişk li meydana gund gurengê de kom kirin. Jin û zarok, pîr û kal tev de anîbûn. Li ber çavên gundiyan gişkan bavê wî hevalê digot: "Bûye APO'ci", riyê sofî girtin bi erdê ve xiriqandin (kişkişandin). Gundiyeke tenê jî newêribû li hemberî vê hovîtiyê derketa. Gişkan seyr kirin, deng ji tu kesî derneket. Mirov digot qey gişk ker, kor û lal bûne. Di dawiyê de jî li ber çavên me hemûyan agir bera riyê sofî dan û jê re gotin: "Tu heya sê rojan mala xwe ji vî gundî bar nekî, emê mala te jî bişewitînin." Sofî di nav xwîné de hiştin. Wê gavê agir ket nava dilê min, çavên min tijî hêstir bûn. Ez pir fikirim; lawê sofî çiqas tiştê ne qenc kiribû ku, leşkeran wiha li sofî kir? Min bersiva vê pirsê xwe nedît. Ji wê rojê û pê de, leşkeran nema bela xwe ji gundê me vekirin. Digotin ku ev gundê teroristan e. Di dawiya wê de jî, gundiyan gişkan mala xwe, ji ber zilm û zordariyê

Ji dilê te tev de xwîn jî bê, hêstirên çavên xwe neherikîne. Reşikan li serê xwe girê nede. Şîne ji bo min nekin, heznê ji min re negirin. Ez ne mirî me, ez, şehîd im. "Şehîd tu car namirin." Ev merhaleya girîng besî min e.

bar kirin, gundê xwe, axa xwe berdan, çûne bajêr. Me jî mala xwe bar kir, em jî çûne bajêr.

Li bajêr min hevalên welatparêz nas kirin, mîna hevalan min hêdî hêdî xwe ji nû ve nas kir. Hevalê min kî ye, dijminê min kî ye? Min nû ji ber hev derxist. Êdî min dizana leşkerên dijmin çima riyê sofî şewitandin. Min zanî çima gundiyan gişkan serê xwe xwar kirin û kesî deng nekir. Jiyana me tev de bi feqîrî, jarî, perîşanî, sernizmî û bi teslîmiyetê derbas bûbû. Me navê serxwebûn û azadiyê hiç nedizana, hêviyên me yê neteweyî ji binî ve tune bûn. Min qerara xwe dabû. Ez nema vê sernizmiyê qebûl dikim, ez nema vê teslîmiyetê radigirim. Divê ez jî li hemberî vê hovîtiyê derkevim, ez jî bibim şervanekî serxwebûn û azadiya gelê xwe, li hemberî vê zilm û zordariyê ez jî li ber xwe bidim. Hêviya min pir mezin bû, eşq û evîna min wekî Cûdî û Gabar mezin bû, nema ez li malê digirtim. Evîna min a mezin ez kişandim nava rafên şoresê, nav berxwedanê. Êdî ez ne lawê we tenê bûm, ez lawê welatê xwe bûm, ez lawê Kurdistanê bûm.

Hatina min a şoresê serbilindahiya we jî bû, şeref û haysiyeteke pir mezin bû. Ez

heya li malê bûn, ez lawê we tenê bûm, ez heya li malê bûm tu dayika min tenê bûyî. Îro ez bûme lawê welatekî, neteweyekê. Tu jî bûyî dayika bi sedan, bi hezaran, bi milyonan.

Min dixwest dilê we jî wekî dilê min bixwaze, min dixwest serê we jî bilind bike, min dixwest hûn bi min kêfxweş û şad bibin. Lê belê we dilê min pir êşand. We kul û xemên min hîn zêdetir kirin, ji bo hatina min pir gazincên we çêbûn. Ew gazinc, wekî kevir ketin ser dilê min.

Nebêje; lawekî min tenê hebû, ew jî çû. Çima yê ku 5-6 lawên wan hene, ew naçin, lawê min yek tenê bû ew jî çû? Barê şoresê li ser milê her kesî ye. Heya em bîndest bin, ez yek jî bim, hezar jî bim ferq tune ye. Her tiştên me di bin destên dijminan de ye. Mala me, dayikên me, bavên me, zarokên me, gişk di bin piyan de ne. Tiştêkî me yê azad nemaye. Ez dixwazim hûn min fêhm bikin. Heke hatina min girêdana we ya bi şoresê ve bûya, ezê bihatama. Lê belê min seh kiriye hûn bêhêrtir ji şoresê dîr dikevin. Dûrketina we ya ji şoresê, dûrketina we ya ji hezkirina min e. Hûn çiqasî ji min hêz bikin, hûnê ew qasî rêça min bigirin, hûn bernadin, hûnê ew qas ber bi min bî. Ez dixwazim hûn

ji min dîr nekevin. Xwîna min li erdê nehêlin, ala destê min nehêlin ku bikeve erdê. Ez ne ku ji we hez nakim, ez ne ku ji we aciz bûme, ez ne ku we naxwazim, ez ne ku ji jiyane hez nakim. Ez ew qasî ji we û jiyane hez dikim ku, ez ji bo wê diçim mirinê, ez ji bo jiyaneke serbixwe û azad canê xwe didim. Min xwe ji jiyana we ya azad re kiriye feda. Ez dixwazim vê bi we bidim fêmkirin, dema we fêmkir, dilê minê hûnik bibe, çavên min li paş namînin.

Ew heft sal in min hûn nedîtine. Min pir bêriya we kiriye. Her du xwişkên min ji ber çavên min naçin. Bavê min bila dev ji gazincan berde û nameya min baş fêhm bike, wê dilê min hûnik bike, kêfa min xweş û dilê min şad bike. Pir xwesteka min hebû ez di saxiya xwe de ji te re nameyekê binivîsinim. Piştî heft salan min dest avêt pênûs û kaxezê, ji te re minê çend gotin binivîsandana. Ez li Herêma Amedê li serê kaniyê bûm. Dijminê hov nehişt ku ez nameya xwe xelas bikim, nameya min nivco ma, dijmin dora me tev girt, em ketin lecê (lihevxiştinê). Dilê min tijî gul bûn, xwîna birînen min wekî Çemê Nêrdûş diherikî. Xwîna min zarokatiya min anî bîra min. Bi tirêja serê sibê re min çavên xwe danî ser hev û din û carekê di jî venekirin. Ez bûn şehîdê serxwebûn û azadiyê, ez bûn şehîdê jiyaneke nû. Pir kêfa min xweş e, cihê min xweş e. Ez di paytexta xwe de lil ser axa Kurdistanê radizim, cilên min tev bi xwîn û hê li min in, ez di nav hevalên xwe de me.

Dayê!.. Wextê ez ji cem we hatim, te ji min re nelîland, tu nekeniyayî û te kêfa xwe xweş nekir, te çavên xwe tijî girî kirin, te ser dilê xwe tijî kul û xem kir. Şîne û hezna ku we ji min re girt, ez kuştim. Vê carê serê xwe bilind bike, ez naxwazim te jar û perîşan ku di quncikekî de diricifê bibînim, ez naxwazim te ji xwe dîr bibînim, ez naxwazim hêstirên çavên te bibînim. Nebêje ku lawekî min hebû mir. Li ser min negirî, dilê xwe qayim bike. Ji dilê te tev de xwîn jî bê, hêstirên çavên xwe neherikîne. Reşikan li serê xwe girê nede. Şîne ji bo min nekin, heznê ji min re negirin. Ez, ne mirî me, ez şehîd im. "Şehîd tu car namirin." Ev merhaleya girîng besî min e. Hûn ji min hez bikin, hûnê rêça min bigirin, hûn rêça min bernadin, ez jî tim bi we re me û di reka xwe de me. Xwîna min ku rijayaye ser axa welatê min zuwa nabe, heta ew ax azad nebe.

Dayê!.. Ez dizanim, dema te ev nameya min xwend û xelas kir, tuyê hêstirên çavên xwe jî xelas bikî. Çavên te ziwa bûn, dilê te tijî xwîn bû. Ez naxwazim te zêdetir biêşînim. Ev yazdeh sal in ez ji we qetiyam û min hûn nedîtine. Lê belê ez tim we li ber çavên xwe dibînim

CEMAL ÖZDEMİR (RÊZAN)



- 28.1.1921: Serokê Partiya Komunîst a Tirkîyeyê (TKP) Mustafa Suphi tevî 15 hevalên xwe di Derya Reş de ji aliyê kemalîstan ve hate xeniqandin. Her wiha kemalîstan nedixwestin ku bandora komunîstan li ser gel çêbe, lewre jî nehiştin ku ew bikevin Tirkîyeyê.
- 31.1.1919: Kovara "Kurdistan" ji aliyê Mehmet Mihri ve dihat derxistin, li Stenbolê dest bi weşana xwe kir. Vê kovarê li ser ilm, civak û edebiyata kurdî weşan dikir. Kovar bi temamî 37 hejmara derket. Li gorî hin agahîyan kovarê di sala 1918'an de dest bi weşanê kiriye.
- 31.1.1950: Kovara "Şark Mecmuası" ku ji aliyê Musa Anter û Şehmûs Elçi ve hat derxistin, dest bi weşana xwe kir. Armanca kovarê

- pêşvebirina Kurdistanê bû ku wekî herêmeke îhmalkirî dihat binavkirin. Ev kovar, kovareke siyasî, civakî û serbixwe bû û bi zimanê tirkî dihat weşandin.
- 1.2.1922: Kovara Rewşen ku berêmeke NÇM'ê ya çandî, hunerî û wêjeyî ye dest bi weşana xwe kir. Kovara ku niha bi navê Jiyana Rewşen tê weşandin dîwajoya wê kovarê ye.
- 1.2.1994: Endamê Partiya Demokrasiyê (DEP) Faik Karatay li Îdirê ji aliyê hêzên tarî ve hate kuştin.

AWIR

Çimdê jew kemalîst de tarîqat û mezhebî

Goreyê vatena Eyüpoğlu, serhewadayîne Şêx Seîd de giştî îngilîzan esta. Heta ey vat ke îngilîzan konsolos rişt Amed, la belê Tirkîye serhewadayîne kurdan qedîna, qandê coya konsolos nêrasa Amed, ek verê serhewadayîn birasayê se, nika Kurdistan niyabi ro.



21'ê aşm de nuştox İsmet Zeki Eyüboğlu Partiya Piştgirî û Azadî (ÖDP), şaxa Üsküdar de semînerê da. Nameyê semînerî "Tarîqat û mezhebî" bî. Eyüpoğlu qîsey xwi wina akêrdî: "Din de îslamê de, ne mezhebî estê, ne jî tarîqatî estê. La belê ewro 400 tarîqat û 200 mezhebî vejîyayê werte û niyê namedê îslamiya xeftîyanê. Wextê Hz. Muhammedî de tarîqat çînebî. Wa hemû kes bewno tarîqatê pexemberî bibi? Çînebî. Eyüpoğlu vatenê xwe wina dom kerd: "Bewnê dîroka tarîqatan, kokê ci İnan o; sera 1500 û 1600 de mabenê osmanî û dewleta İrani xerpiyê. İrani jî o wext tarîqata Nexşibendî namedê îslamiya nê ro û rişt Anatoliyê, waşt dewleta osmanî burjîno. La belê dewleta osmanî o wext 40 hezar alewî kiştî. Nê serva tarîqatana bî Bado tarîqata Nexşibendî miyan ra 4-5 hebî tarîqatî vejîyay û nê ewro biye 400 hebî."

kurdan qedîna, qandê coya konsolos nêrasa Amed, ek verê serhewadayîn birasayê se, nika Kurdistan niyabi ro.

Zeki Eyüpoğlu wina îdia kerd: "Seîdê Nursî xwi miyanî miyanî kerdê cadê pexemberî. Verî namedê Risalê Nurî de 114 hebî risaley nustî. Bewnê Qurân de jî 114 ayetî estê. Senî ke misilmanan veng vet, ney risaley kerdî veşî. Feqet ewro serokê hemû tarîqatan xwi kenê cadê pexemberan. Vanê: 'Ma Homa'y ra nişan giroto.' Yanê nê tarîqatî pêro sextekarê." Ey mezheban ser jî wina vat: "Mislîmanî de mezhebî wexto ke Hz. Alî kişya o wext vejîyay werte. O wext mislîmanî, bî 2 mezhebî: alewîyey û sûniyey. La belê ewro nê mezhebî biyê nezdiyê 200 hebî."

Eyüpoğlu qîseyê xwi wina dom kerd: "Mislîmanî de mezhebî çînyê, mezhebî jî zey tarîqatan vejîyayê werte. Yanê senî MIT, CIA, MOSSAD estê, nê tarîqatî jî o wext cayê nînan giroto. Nika şîmadê vajê ezo çira wina vana, bewnê, nê pêro vanê mayê qandê mislîmanî xeftîyami, la belê nimêjê (nemazê) nînan bîle pêjewînan nêtepişeno. Nê mezhebî gorey, zanayenê xwi nimêjî kenî. Goreya vatenê İnan Quran de wina nûsiyayo. Nê zûr ê, çîmkî Quran de nimêj senî beno, çînyo. Quran de jew wina vajîyeno: "Nimêje bikrê, senî bikrê nêvano."


Semîner nezdiyê 50 merdiman temaşe kerd, semîner de, 2 sermayenê HA-DEP'ê Üsküdar jî bî. Vatenandê Eyüpoğlu ra tevawo winanîno vejîyeno werte: Eyüpoğlu jew kemalîsto û goreyê îdolojîyê kemalîzm tarîqat û mezhebî wînyayê.

Fina Eyüpoğlu vat ke, ewro Tirkîye de hema hema hemû tarîqatê rayda Seîdê Kurdî de şîne. Eyüpoğlu da zanayen ke, nameyê Seîdê Nursî o verî Seîdê Kurdî bî, bado no name xwi ra giroto. Eyüpoğlu na mîsele sero wina vat: "No çî ra wina bî? Bewnê Seîdê Kurdî kamo? 1919 de ronayîndê Kombiyayîne Berzkerdena Kurdistanî (Kurdistan Teali Cemiyetî) de ca geno, fina serhewadayîna (serhildan) Şêx Seîd de ca giroto; sera 1950 de wexto ke têkoşîna kurdan qedîya ey jî nameyê xwi kerd Seîdê Nursî."

Goreyê vatena Eyüpoğlu, serhewadayîne Şêx Seîd de giştî îngilîzan esta. Heta ey vat ke îngilîzan konsolos rişt Amed, la belê Tirkîye serhewadayîne

ÇAVDÊRÎ

MÎRHEM YÎÇÎT



Netewe bi zanîngehên xwe serbilind in

Tema û dabaşa unîversîtê ez bawer dikim de ji bo xwendevanên me balkêş be. Unîversîte merkezên zanîyarî û lêkolînê ne. Neteweyek ji neteweyên dinyayê ku layiqê navê netewetiyetê ye û ji neteweyên zemanê me hesab dibe bêyî unîversîte nemaye. Pir caran netewe pesnê xwe bi unîversîteyên xwe didin. Kes hene quretîyên xwe bi bawernameyên zanîngehên fîlan û bêvan welatî dikin.

Gava ku gotin tê ser zanîngehan, îtalî dorê nadin kesî û dibêjin: "Berî bi 1000 û 1100 salî li welatê me zanîngehên Salarno û Bologno hebûn." Fransî serê xwe bi unîversîteya Sorbonê, îngilîz bi yên Oxford û Cambrîgê, alman bi yên Heidelbergê û Kolnê, çek bi ya Karlova, swêdî bi ya Upsala û Lundê bilind dikin.

Berî zanîngeh bibe sazûmaheke daîmî, xwedî karakter û rengekî serbixwe bigire, li hin cih û deveran mamoste û xwendevanan hev didîtin her çendî xaniyên daîmî nebûn jî.

Zanîngehên ewil li İtalyayê çêbûne. Pişt re Fransa û pişt re İngilîstan û hê piştê retîr jî edî Almanya û welatên din yên Skandinavya û Ewropaya Rôjhilat tî. Yekemîn unîversîteya li İtalyayê Salarno di sala 1231'ê de resmî dibe. Berî vê hê di salên 800'î de mîna xwendegeheke bijîşkiyê dihat naskirin. Di dawîya salên 1000'î de li Bologno Unîversîteyêke din bi pêş ket. Ev wekî Zanîngeha Salerno ne bi tenê yekşaxî bû, şaxên din jî hebûn. Zanîngeha Bologno ewil mîna xwendegeheke dadmendiye hate naskirin, pişt re di nav salan de şaxên tibê, huner û îlahiyatê jî lê zêde bûn.

Di nav unîversîteyên serdema navîn de Unîversîteya Parîsê ya herî navdar e. Salên piştî 1150'î Zanîngeha Parîsê ji bo unîversîteyên îngilîz Oxford û Cambrîgê dibe nîmûne û li seranserê Ewropayê serdema zanîngehan dikeve kar.

Li Tirkîyeyê yekemîn xwendegeha di tayê zanîngehê de ye Darulfunûnê. Di sala 1863'an de tê damezrandin. Berî vê jî hin xwendegehên bilind hene. Wekî Muhendîsxaneyê Deryayî (1773), Muhendîsxaneyê Bejayî (1793), Tîpxane (1826) û Dibistana Cengê (1834).

Di wateya rojavayî de zanîngeha yekemîn sala 1870'yî bi xebatên Saffet Paşa li nêzîka Gora Sultanhmet hate damezrandin. Tehsîn Efendî jî bû rektorê wê. Sala 1871'ê ceribandînen Tehsîn Xoçe ji bo îspat bike ku di cîhanê bêhewa de ruhber nîkarin bijîn, kevokekê dixwe fanoseke bêhewa û konferansa Prof. Cemalettîn Efganî "Pêxemberî hunerek e" dibin sebebên girtina unîversîtê. Dewlet Tehsîn Xoçe û Cemalettîn Efganî ji unîversîteyê diavêje û Cemalettîn sirgûn dike, derdixwe derveyî sînorên dewletê. Heta 1933'an ji unîversîteyê re darulfunûn dihat gotin. Piştî vê salê nav tê guhertin û dibe unîversîte.

Li welatê me her çendî dîroka zanîngehan pir kevn e jî, îro zanîngehên ku zimanê wan bi kurdî ne li başûrê Kurdistanê ne. Zanîngeha Silêmaniyê sala 1969'an çêbûye. Ev zanîngeh ewil 3 fakulte bûn, pişt re hejmara fakulteyan bû pênc. Sala 1978'an deshelatdariya baasî Zanîngeha Silêmaniyê lexû kir û guherte Hewlêrê û navê wê jî kir Zanîngeha Selahedîn. Niha ev zanîngeh ji 6 fakultyan pêk tê. Di sala 1993'yan de careke di ew neqlî Hewlêrê bû. Zanîngeheke din ku di sala 1993'an de hate vekirin Zanîngeha Hewlêrê ye. Ew jî ji 5 hatiye pê.

Çavkanî: Dîroka pedagojî û perwerdekarîyê, John Landquist, Torsten Husen 1969 Lund.

Em vê hefteya hanê jî beşa duduyan a vê rêzenivîsa ku ji aliyê nivîskar-rojnamevan FAYSAL DAĞLI ve hatiye amadekirin diweşînin. Em bidin xuyakirin ku wê dawî li rêzenivîsê neyê û hefteya pêşiya me jî bidome. Di vê beşa duduyan de serpehatiya koma Operasyona Mamût bi awayekî balkêş tê vegotin.

Beramberî petrolê dewleteke kurd

Endamê rêxistina Hîwâ Remzî Nafi Reşîd û zabitê alman Gottfried Johannes Müller, li ser bingeha "li beramberî petrola kurd dewleteke kurd" peyman çêdikin. Kurd wê petrolê bidin almanan û wê ew jî alîkariya avakirina dewleteke kurd bikin û îngilîzan ji Kurdistanê derxînin. Remzî wê bibe serokêkî vê dewletê. Peyman wisa çêdibe.

Ji bo ku bi hev re îxanetê nekin, sond dixwin. Müller li ser ala alman sond dixwe. Lê aleke kurd tune ye ku Remzî li serê soz bide. Ji bo Kurdistanê ku muxayîla wê hatiye akirin, alek jî pêwîst e. Di nav şerîdên sor û şîn de rojê zer datînin û Remzî li ser wê alê sond dixwe. Ev al jî aliyê rêxistina "Cemiyeta Rizgarî ya Kurdan" ve li Stenbolê di sala 1941'ê de hatibû çêkirin. Ew tesadûfek e an na, em nizanin. Îhtimal e ku Remzî an jî Müller ev al li Stenbolê dîtîbin û ew jî xwe re wekî nimûne girtîbin.

Ji bo sondê pêwîstiya bi alê

Naziyan hêviyeke mezin bi vê operasyonê ve girê dane. Ew bawer dikin ku, paşveçûna li hemberî Artêşa Sor bi vê operasyonê bê sekinandin. Eger li Kafkasyayê cepheyê nû vebe, wê artêşa alman ji pesta Sovyetê xelas bibe û wê li Stalîngradê bextê wan biguhere. Bi cepheyê nû û bi petrolê, wê karibin leşker û panzerên xwe bi rê bixin û hêzên Artêşa Sor bikin du qet.

Müller û qefleya xwe berî ku Remzî nas bikin sê meh li tixûbê Slovenyayê, li Herêma Bodental û Singerbengê perwerdeya leşkerî kirine. Ev der di bin dagira alaman de ye û gelê Sloven ji wan hez nake. Dema perwerdeya wan dewam dike, gerilayên Sloven, yek ji alîkarên wan jî dikujin.

Xwe-avêtina ji paraşûtê, meşê li çiya û arazî, bi tabîatê re têkoşîn û muxarebe dersên wan ê girîng bûne. Piştî ku Remzî jî daxilî qefileyê dibe, sê mehên din jî tathîqatên xwe didomînin. Müller dibêje ku Remzî dema tathîqatan wekî pilingelî jêhatî û cara pêşîn bêtirs xwe bi sedan metre ji jor ve bi paraşûtê avêtibûye.

Müller dema ku perwerdeya wan didome, armanc û hedefa operasyonê, tenê ji Remzî re gotiye, haya hevalê wan ên din jî wê tune ye.

Remzî li kampê ye

Piştî qedandina hiziriyên, Remzî û sê zabitên alman diçin bajarê Qirimê, ku ev der di bin dagira artêşa alman de ye û li kêleka Behra Reş e. Wê li vir, li balafirê siwar bibin û berê xwe bidin Kurdistanê. Hedefa wan Herêma Silêmaniyê, tixûbê Îranê ye.

Operasyon bi koda Mamût dest pê di-

ke. Ev nav jî navê heywanekî gir e ku li ser rûyê erdê neslê jê nemaye hatiye stendin. Sebebê wî navî jî ew e ku girîngiya operasyonê nîşan bide.

Li gorî plan, qefle wê pêşî bigihîje Kurdistanê bi Şêx Mehmûd, Serokê eşîrên Pişderî Siwar Axa û Bavê Remzî, Nafi Reşîd Axa û hinek rewşenbîr û axayên din re têkêve têkiliyê û dest bi haziriyên serhildanê bike.

Remzî jî, mirovekî di nav Rêxistina Hîwâ de naskirî ye û ji ber bavê xwe li herêmên Hewlêr, Qoy û Şeqlawaya gelek bi tesîr e. Piştî ku serhildanê bidarxistin, di merhaleya duduyan de wê paraşûtvanên alman xwe bigihîjînin herêmê û wê derê bi dest bixin.

Müller birayê xwe Hanzel jî daxilî qefleya operasyonê kiriye. Birayekî wî jî di şer de miriye. Hanzel, wê li bajarê Qirimê bisekine û li vir xeberên ku ji cîhazên Müller û Remzî bistîne, bişîne Berlînê. Li Berlînê jî Berpirsê Operasyonê Hans Kristof heye û ewê bi paraşûtvanan re were Kurdistanê.

Li asîmanên Kurdistanê balafirek

Sal 1943 ye, şeveke pûşperê ye. Remzî tevî 3 zabitên alman li bajarê Qirimê li balafirê siwar dibe û berê xwe didin asîmanên Kurdistanê. Uniformayên leşkerê alman li wan in, di bin de cilên kurdan li xwe kirine. Her yek du pasaportên wan hene. Yek a almanan û yek a Iraqê. Navê Remzî li gorî pasaporta almanî Mayer e û karê wî di artêşa alman de çawîş e. Hemû jî wekî kurdekî bi simbêl in û porê wan kin in.

Balafir nivê şevê bi hewa dikeve. Lê tewrên pilot ne bi dostanî ne. Gelek bilind difirin, lê pilot tenê sê cîhazên oksîjenê bi xwe re anîne. Remzî û hevalên wî, yek ji van bi dorê bi kar tînin.

Pêwîst e balafir di ser Gola Urmiyê re derbas bibe û wan li cihêkî xalî biavêje, ku tu mal an jî gund lê tune bin. Hedefa wan bakurê herêma Silêmaniyê ye. Lê belê ew çend caran li ser bajarekî derbas dibin ku roniyên wê tenê dîtînin. Müller û Remzî jî wî rik diştînin. Lê pilot dibêje ku tu xeletî tune ye û noqteya wan ev der e. Ji ber girîngiya operasyonê eger ku xeletiyek hebe, gerek e bizivirin. Lê piştî ku roniyên jêrê wînda dibin, pilot îşaret dide ku xwe berî jêr bidin.

Piştî ku ew bigihîjin herêmê, ji bo ku balafir xwe deynin wê meydanekê çêkin û raderekê li wir deynin. Koma li paş wan wê were, ewê sîleh û cebîlxane bîne. Wê ew li kurdan bîne belavkîrin. Di nav sîlehan de roketên balafirşkên û tankşkên jî hene. Hêzên kurd wê ji aliyê zabitên alman ve bêne amadekirin.

Haziriyên wan ên Kurdistanê wê bi qasî sê mehan biajon. Di vê pêvajoyê de wê Remzî agahî û îstîxbaratan ji bo bin-



Welatparêzê û Operasyon

gehiya operasyonê bicivîne. Agahiyên teknîkî bicivîne û Serkanîya Leşkerî ya Alman a Berlînê li gorî wan wê qerarê bidê.

Hedefa pêşîn bîrên petrolê

Bi destpêka serhildanê re, wê herêmên petrolê dagir bikin û paraşûtvanên alman werin. Li Îran û Iraqê hikûmet bi dizî amade bûne. Piştî serhildanê ewê dest deynin ser îdara wan welatan.

Müller bawer dike ku derbasî hereketê bibin, ji bilî eşîrên kurd, qismekî artêşa Iraqê jî wê derbasî aliyê wan bibe.

Hedefa wan a yekemîn bîrên petrolê ne, ku dixwazin wan bi dest bixin, paşê îmhakirina balafir û tankên îngilîzan û girtina riyana e.

Bi van hêviyan ew li balafirê siwar dibin. Balafira wan a bi navê "condor", bi taybetî ji bo operasyonê hatiye çêkirin.

Qefleya operasyonê xwe berî valahiye dide. Tavehîv e. Bi wan re çar jî sandoqên mezin hene. Di van de cil, derman, bêtêl, sîleh û cebîlxane hene. San-

doqek jî tije pere ye û 'Ala Kurdistanê' jî tê de ye. Bi pere kurdên bêdîl, bi sîleh û alê jî yên bi heyecan wê bikişînin ba xwe.

Dema ku bi paraşûtê xwe berdîdin, li jêrê çemekî mezin dibînin. Ewê navê wî çemî paşê hîn bibin. Ev çem Dicle ye. Lê di hedefa wan de cihêkî wisa tune ye. Roniya bajêr û şewqa tevehîve wan hê li hewayê ditirsîne. Wan fêr kiriyê ku xwe avêtine cihêkî şaş.

Li gorî plana wan pêwîst e bikevin herêmeke çiyayî û xalî, lê cihê ku ketinê nêzî çemekî mezin e û li der û dora wî jî gund hene. Û gelek dûrî hev ketine, sandoqê wan ên giran jî bi kilometreyan dûrî wan ketine û wînda bûne. Piştî ku dibe şefeq, hev dibînin. Wan fêr nekiriye ku ketine kîjan welatî jî.

Îngilîz bi wan dihesin

Dema ku Remzî dibîne, hedefa wan ne ew der e, wekî gurekî çavsor bi qirika Müller digire û dipirse: "Ka çiya?" Piştî munaqeseyê kin, qerar didin ku wê di bin berpirsiya Remzî de hereket bikin. Hinekî dimeşin û rastî mirovekî



bê tîrs Remzî a Mamût (2)

tên, ku ew li nav erdê xwe dixebite. Remzî diçe ba vî gundiya û jê hinek pirsan dike. Tê fêmkirin ku ew li başûrê Kurdistanê ne û ketine nêzî bajarê Mûsilê. Ev gund jî gundê nastûriyan e.

Derdikevin ser rê û di bagaja otobosê de diçin bajarê Mûsilê. Rê, ji aliyê leşkeran ve hatiye girtin. Remzî bi bertîl wan xelas dike. Li nav Mûsilê mala mirovekî Remzî heye.

Li bajêr tê fêmkirin ku leşkerên îngilîz û ereb li hinekan digerin. Ser pira ku diçe bajêr girtine û hemû însanên ku dixwazin têkivîna Mûsilê bi kurdî didin xeberdan. Xwe di nav kûçeyên teng de diavêjin çayxaneyekê. Remzî diçe mala mirovê xwe û vedigere. Ew bi rewşê hesiyaye. Îngilîz li wan digerin. Serê mirovekî jî 250 Dînar xelat danîne ku wê demê pereyekî mezin e. Ev difikirin ku li cihê ketine, sandoqên wan hatine dîtin loma deşîfre bûne. Ew mecbûr in xwe hema bigihîjin Hewlêrê.

Heta Çemê Zapê ku ew di nav Hewlêrê û Mûsilê de cih digire, dimeşin û li ber çem li kerekî siwar dibin. Li wan deran jî rê û cihên derbasbûnê ji aliyê leş-

keran ve hatine girtin. Dîsa bi dekên Remzî ji wan difilitin. Çend hespan distînin ku xwe bi wan biavêjin Hewlêrê, lê di rê de hespên wan tên dizîn.

Nihayet xwe diavêjin gundê Tercanê, ku ew li ser Hewlêrê ye. Ew der malixaneyaya malbata Remzî ye ku havînan li vir derbas dikin. Gundî mirovên hev in. Li vir hinek bêhna xwe didin û bi şevê di bin muhafazeya mirovên Remzî yê çekdar de, tevî hespan diçin mala bavê Remzî, ku ew bi navê Qesra Atewlaxa tê naskirin.

Remzî, hevalên xwe yê alman li derve dihêle û bi tenê diçe malê. Niv saet pişt re tevî kekê xwe difetile ba wan. Bavê wî ji bo taziyekê çûye Hewlêrê.

Kekê Remzî ku navê wî Qerenî ye, bi tewreke sar li almanan silav dike. Û dibêje mixab e ew nikare alikariya wan bike. Bavê wî demekê di nav refên serhildahiyan de cih digire, lê piştî têkçûna serhildanên Şêx Mehmûd, soz daye ku ewê li dijî îngilîzan êdî nexebite.

Qerenî dibêje wan ku wê karibin tenê şevê li mala wan bimînin. Eger eşkerê bibe ku ew hatinê mala wan, wê leş-

kerên îngilîz mala wan bişewitîne û hemûyan biavêje hepsê. Qerenî ji ber wê tîrsa xwe nahêle ku Remzî bavê xwe ji bibîne û pê re xeber bide. Adet û kevnesopiyên kurdan dest nade ku Remzî li ber kekê xwe rabe.

Rewşa ku bala Müller dikişîne

Roja ku li qesra bavê Remzî dimînin, birayê biçûk ê Remzî Suad û xulamê wan Hecî Elî alikariya Remzî û almanan dikin. Ew ji wan re çîrokên ku li bajêr li ser wan tên gotin dibêjin. Li gorî van çîrokan, almanên ku xwe bi paraşûtan avêtine, agir ji wan dibare. Ew bi devên xwe tankên îngilîzan dixwin û leşkerên wan perîşan dikin.

Van çîrok, efsane û derewan di esasê xwe de hesreta kurdan a azadiyê îfade dikirin. Lewre ew ji dagirkerên îngilîz û ereban gelekî tijî bûbûn.

Bala Müller dikişîne ku Remzî di nav maliyên xwe de û di nav xizmetkar û mirovên xwe de tê hezkirin. Ew jî, ji ber ku Remzî li wan axatî nedikir û li hemberî wan jidil bû. Müller dibêje ku, maliyên wî ji re digotine, "ew dîn e."

Belê, wî ew qas mal û milk terikandibû û ji bo Kurdistanê dixebitî û diket bin talûkeyên mirinê. Wan ev eşq fêm nedikir û jê re digotin "ew dîn e."

Bavê Remzî ji taziye nafetile. Musadeya sekna wan a li malê jî qediyaye. Li ser vî yekê, qefle planeke nû çêdike. Li gorî vî planê, wê xwe bigihîjin herêmeke bi ewle, yanê çiyayan. Ji nav wan yek wê xwe bigihîjîne Tirkîyeyê û here konsoloxaneyaya almanan. Wê ji Berlînê alikariyê bixwaze.

Bi balafirên wê qefleyeke din tevî lazmatîyan xwe bigihîjin wan û ewê ji nû ve dest bi xebatê bikin.

Hecî Elî, ji bo ku qefleyê bigihîjîne çiyayan, wê birayekî xwe bide ba wan. Lê birayê wî ne hazir e. Qefle ji bo ku li benda birayê Hecî Elî bisekine wê here gundê Biyokê. Ew gund jî yê pismamê Remzî, Xurşîd Nureddîn e.

Xurşîd jî welatparêz e. Dema li Bexdayê xwendevan in, li ser xelasiya Kurdistanê bi hev re plan çêkirine. Qefle li Kurdistanê cara yekemîn ji Xurşîd re plana xwe dibêje. Pismamê Remzî, dibêje ku ji bo rizgariya Kurdistanê wê alikariya wan bike. Dema ew dest bi herreketê bikin, ewê jî tiştê ji destê wî were, bike. Niha jî wê wan veşêre, ku heta rêberê wan tê.

Îxaneta qaçaqxçî

Gund li ser rê ye. Pir caran mêvan diçin û tên. Ji ber ihtimala îxbarê ew diçin li şikefteke nêzî gund disekin. Navê wê "Şikefta Qaçaxçiyana" e. Li cihêkî aasê ye. Li nêzî şikeftê maleke mirovê Xurşîd heye. Ew ihtiyaciyan xwe ji wê malê temîn dikin. Heta ku rêberê wan were wê ew li wir bisekinin. Piştî ew were, wê berê xwe bidin çiyayan. Her şev yek ji wan nobetê digire.

Hefteyek di ser hatina wan a Kurdistanê re derbas bûye. Sê roj in jî di şikeftê de li benda rêber in.

Roja sisiyan, li nêzî şikeftê rasti komeke siwaran tên. Ew bi çek in jî. Qefleya Mamût, wan dawetî çayê dikin.

Li şikeftê sohbetê dikin. Dertê meydanê ku ew grup qaçaqxçî ne û diçin Hewlêrê, ji bo firotina titûnê. Ew mirovên diya Remzî ne, ji Eşîra Xoşnavî ne.

Piştî sohbet û samîmîyetê Remzî sekna xwe ya li şikeftê û armanca çûna wan a tixûbê Tirkîyeyê ji wan re dibêje. Bi qaçaqxçiyana re peymanekê çêdikin. Piştî ku ew titûna xwe bifiroşin û bifetilin, ewê wan bibin cihê ku ew dixwazin.

Remzî hinek jî pere dide wan ku ew ji fikra xwe venegerin. Piştî ku qaçaqxçî berî wî werin, wê alman bi wan re bi rê bikevin û Remzî jî paşê bigihîje wan.

Her şev yek ji wan li ber şikeftê nobetê digire. Roja ku qaçaqxçî ji ba wan diçin, bi şev gelek polis û leşkerên ereb ber bi şikefta wan ve tên. Ew xwe di nav dehlî li ba şikeftê de vedîşerin. Lê leşkerên Iraqê, der û dora wan girtine, îmkanên rizgariya wan tune ye. Leşker bi navê wan deng li wan dikin û dixwazin ew teslîm bibin. Demeke din ew mecbûr dibin ku teslîm bibin.

Li pişt leşkeran, yek ji wan qaçaqxçiyana heye. Ew mirov li Hewlêrê dibihîze ku îngilîz li Remzî û hevalên wî degerin û ji bo serê wan hezar dînar xelatê didin. Pişt re çûye îxbara wan kiriyê û ketiyê pêşiya leşkeran û ew anîne ser şikeftê.

Operasyon bêyî ku dest pê bike diqede

Bi vî awayî, Operasyona Mamût berî ku dest pê bike, diqede.

Leşkerên ku ew girtine, pirê wan kurd bûne. Bi almanan bi awayekî xerab muameleyê nakin. Destê wan jî girê nadin. Wan didin pêşiya xwe û berê xwe didin Hewlêrê. Kumandarê wan teymernekî bi navê Bedîî Sasan e. Xayîn her çiqas li ser hespê xwe wekî ku karekî baş kiribe tewran nişan dide jî, leşker guh pê nakin.

Li ser girtina almanan û eşkerên bûna operasyonê hemû Iraq û Kurdistan heyirî dimîne. Li Hewlêrê polisên kurd sempatiya xwe ji wan re eşkere dikin.

Bi almanan re muameleya êsîrên şer dikin û îşkenceyê bi wan nakin. Piştî girtina wan, du roj bi şûn de bi carekê deriyê hucreya wan vedibe û Remzî di nav xwîna de diavêjin ba wan. Hişê wî ne li cih e, ji ber îşkenceyan dinale. Piştî demekê bi xwe dihesse. Müller ji wî efûyê dixwaze, ji ber ku ew bûye sebêbê vî tiştî. Lê Remzî dibêje: "Bi ber nekeve, qedera me wisan e."

Piştî Remzî ji wan vediqete diçe gundê pismamê xwe Xurşîd. Hinek serma girtiye û nexweş dikeve. Bi şev li vir dimîne. Roja din bavê wî û hemû birayên wî tên girtin. Li ser vî yekê Xurşîd, adêten kurdan tîne bîra Remzî. Bavek ji bo kurê xwe bê girtin, pêwîst e kurê wî teslîm bibe û bavê xwe xelas bike. Remzî dibêje:

"Ez teslîm bibim, wê planên xelasiya welat xera bibin."


Piştî çendeyekê dibihîze ku hevalên wî jî hatine girtin. Ji ber ku hemû xeyalên wî têk diçin, dixwaze întîxar bike û xwe bikuje. Lê Xurşîd jê re dibêje manî û wî teslîmî leşkeran dike.

Dûmahîk heye

Şestebaran

Ho barane dûr hawêje asmaniyeye
 Le gel to me.
 To le hewrî siyay derya berzefîr bûy,
 Minîş le siyay deryay welatekem
 Helqolaw im.
 Serinc bide,
 Wekû baranekey to ye
 Fêrmiskî her du çawim.
 Xuzge dilopêkî dûrî to heldirat
 Çend derwat ta degate
 Şwênî mebest.
 Wa gwêm lê ye
 Degroyên ta degata kuncî hest.
 Deba minîş zerdexiney fêrmiskekem
 Bigatewe şwênî mebest
 Ya kuncî hest.
 Ke Hewlêr e, Silêmaniye, Ya Dihok e
 Na Kerkûk e; na Kerlâk e.
 Wekû bêjen
 Mûsiqay baranim bo dejenê
 Le dûrewe her gwêm lê ye
 Ke degrêw pê dekenê.
 Lêm têkel bûwe zerdexene, fêrmisk
 Baranî şest rihêle
 Kore mawe giyan
 Cêm nehêle, cêm nehêle.
 Ba minîş bêm,
 Na giyan, wa ême dên, wa ême dên.
 Giyan e
 Ho Qudsekem
 Ême janî giyan e
 Fêrmiskekanit
 be somay çaw desirmewe.
 Seferêke,
 Baranêke,
 Gulêke
 Her dêmewe, her dêmewe...

MAMEND NECAR



Çend helbestên nûhatî

Hest û birêt min

Dilê min îro bûye gemî
 Xewna min jî derya
 Hest û birêt min
 Keştevan in.
 Xeribên mêrg û dol û çiya
 Çima her aware û bêkes in
 Hey Xuda?
 Qey xerîbî her behra min e?
 Min divê ez bizanim
 Guneha min çi ye?
 Kurd im ez,
 Lew halê min ev e..?!
 Çerxê layzer û mayzera ye
 Û doza min hê winda û berze ye.

ZARA BAŞÛRÎ

Dem

Dem wê bê,
 Tirs wê rabe,
 Zilm wê rabe ji holê.
 Dem wê bê,
 Di nav dilan de pir ava bibin
 Dest bidin hev wêk biran
 Bes bigirî, bes bigirî

Va nêzik e Jin dide dara aşti
 Mizgîn be.

Dem wê bê,
 Ewrên tarî wê bela bin
 Roj wê hîlbê li şunê.

Dem wê bê,
 wê bibe, bihar dar şîn bibin
 Kulîlk vebin li çolê
 Bes bigirî, bes bigirî
 Qêrina te diweşîne tovê jînê
 Li nav dilê gerdûnê.

Dem wê bê,
 Di nav rêza mirovahiyê de
 Tê cihê xwe bigirî

Dem wê bê,
 Dilê bi evîn reşgirêdayî
 Wê bigirin dilanê
 Bes bigirî... bes bigirî
 Wê dakevin dest bi keleş
 Şervanên me ji çiyê.

NISÊBÎNÎ

Rojekê

Ger rojekê hat dîtî cendekê min
 Li qeraxa paporekê
 Hem jî çavên derxistî
 Poz, lêv û guh jêkirî
 Bizanibe yê li wê razayî ne ez im
 Berê xwe nede ewê miriyî
 Li rojê binêre, li stêrkan
 Berê xwe bide bilindahiya çiyân,
 Ez li wê me...

Belkî

Belkî, serê sibehekê
 Di ronîya pişkivandina şevqê de
 Dema merheba tê gotin
 Ji zayîna rojê re.
 Ger mirin were xweş e.
 Belkî jî, bêmirinî ye
 Dengê mirinê.

Gel

Gel dimîne li cihêkî
 Tixumek temirandî li bin axê
 Genim çawa ku zîl dide
 Dertê ser axê

Bi destên xwe yên xweşik û sor
 Wek berxekî qul dike bédengiyê
 Em jî gel in
 Ji nû ve jîn dibin bi mirinan.

ROŞAN LEZGÎN

Dilber

Dilbera min,
 Biharî bi mêvandari
 Were ser gora min.
 Tîpên navê xwe
 Ji kevirê ber serê gorê
 Ji bakur ve bipiv..
 Li şûna hêsrên dayika min
 Sorgulek şîn bûye..
 Ji xunava wê bipirs,
 Wê rêya dilê min pêş te ke.

Bêrivan

Bêrîvana dilê min,
 Ma tu, jî dotina çavên min têr nabî?
 Ditirsîm guhanê hêsiyan ziwa bibin
 Wê gavê, wê kî meşka kula hikilê...

RIZOYÊ XERZÎ



Li navendên çandê çalakîyên vê hefteyê
Li NÇM'ya Stenbolê

● 26. 01.1997 Yekşem: Şahiya Ciwan û Zarokên Mezrabotan,
saet: 14.30

Konsera OKM: Koroya Grup Yorum, saet: 17.30

● 31.01.1997 În: Konsera Mazlum Çimen, saet: 17.30

Teatra Jiyana Nû: Bayê Elegezê, saet: 17.30

Li NÇM'ya Îzmîrê

● 26. 01.1997 Yekşem: İstanbul Tiyatro Ateşi: "Yan huner an mirin",
saet: 17.30

● 29. 01.1997 Çarşem: Panela "Li nav kurdan geşedanên siyasî û

jin", pêşkêş Hatice Çoban (NÇM), Derya Çay, Bilgesu Erenus
(nivîskar-hunermend), Günselî Kaya (İHD), Fatma Bayram (HADEP),
Fatma Kayhan (kovara Roza), saet: 18.00

Li EKM'ê

● 26. 01.1997 Yekşem: Filmê "İş", saet: 16.00

Gotûbêja li ser filmên kar û nan, saet: 18.00

Li BEKSAV'ê

● 26. 01.1997 Yekşem: Gotûbêja Ahmet Soner li ser filmê belgeyî yê
Yılmaz Güney "Adana-Paris", saet: 15.00

● 27. 01.1997 Duşem: Filma "Işıklar Sönmesin" (Bila ronî nelemire)
saet: 18.00

RÛDAN

Ajandaya Veşarî an jî Welatê Eşkere

Di film de kujer jî tîmên taybet in. Ew Ayhan Çarkın, Oğuz Yorulmaz, Ercan Ersoy tînin bîra mirov. Her wiha Midûrê polîsan cihê Ibrahim Şahin, berpîrsê oporesyonê yê vîşarî cihê Abdullah Çatlı, Senator O'Neil cihê Mehmet Ağar, Margraet Teacher jî cihê Tansu Çillerê digire.

Navê orjînal: Hidden Agenda

Derhêner: Ken Loch

Lîstikvan: Margaret Tealher, Brad Dourif, Mai Zetterling, Bernard Archard, John Benfield, Bernard Bloch.

Roja 22'yê rêbendanê li Evrensel Kùltür Merkezi filmek hate nîşan dan. Navê film "Ajandaya Veşarî" ye. Ev film salek berê di TRT-2'yê de hatiye weşandin. Bes ez bawer nakim ku zêde kesî li vî filmî temaşê kiriye. Bi kurtasî filmêkî gelek baş bû. Film li ser Îrlandayê hatiye kişandin. Di destpêka film de li bajarê Belfastê meşek heye, lê ev meşa protestanên Îrlandayê ye. Jixwe film li ser jiyana gelê Îrlandayê radiweste û dixwaze ku projektorên temaşevanên bikişîne ser tîkiliya gelê Îrlandayê, IRA û dewleta îngiliz.

Tiştên ku di vir de min dîtî bi min wekî nas bûn. Heta jî bûyeran bigirin, kesên û heya cihan (mekan) jî wisa bûn. Demekê min jî xwe re got: "Gelo ev der Kurdistan e?" Lê ev xewna min û pîrsa min bi derketina erebeyên îngilizan qut bû. Ji ber ku li Îngilistanê sistema trafikê li ser aliyê rastê pêk tê.

Di destpêkê de du zilam û jinîkek di civîna çapemeniyê de agahiyê didin. Mijar kirinên dewleta îngiliz e ku li dijî insanên muhalîf, bi taybetî jî li dijî IRA'yê, pêk hatine. Di wir de li ser hin îşkeceyan disekin. Ev kes du parêzer (ebûqat) in (John Saluvianê amerîkî û parêzerekî îrlandî) yek jî rojnamevan (xoşewîsta Saluvian) Mrs. Casmin e. Ew jî, ji bo parastina mafên mirovan li Belfastê ne. Pişt re em wan di odeya otelê de dibînin. Saluvian, kasetekê guhdarî dîke. Bes, piştî telefonêkê derdikeve derve û di berbanga sibê de bi erebeya xwe diçe cihê randevyê. Li wir kesekî din îcar wî bi erebeya xwe dibe cihê randevûya nû. Lê, di rê de erebeyek di taqîba wan de ye. Di cihêkî nependî (talde) de Saluvian te-



Ken Loch

vî rêberê xwe tê gulebarankirin. Dema ku erebeya wan jî rê derdikeve û disekine kujer jî ji erebeya xwe derdikevin û ser John Saluvian seh dikin (lê digerin), tiştêkî digirin û diçin. Lê dû re hin sazî û dewletên din daxwaza rastiya vî çalakîyê dikin. Ji ber ku ev kes gelek navdar in, bi taybetî jî Saluvian ji aliyê parastina mafên mirovan ve kesekî navdar e di qada navneteweyî de.

Ji ber wê sedemê jî dewleta îngiliz karê ronahîkirinê cinayetê dide mufetişê navdar Peter Carrigian. Mufetiş tevî hevalekî xwe û sekretera xwe dest bi kar dîke. Dibînin ku berevajî îfadeyên fermî cinayet ne bi destê IRA'yê, lê bi destê polîsan pêk hatiye. Tahqîqat ber xwe dide polîsan, digihêje rêveberê teşkilata polîs, MI-5, MI-6, CID, CIA û yên din. Ji aliyê siyasî ve jî digihêje senatoran (wekî Kim Robert O'Neil) û Serokwezîra Îngilistanê Margraet Teacher. Ev organîzasyon bi rastî kontr-gerîla ye û ev xebata xwe ya kirêt li dijî IRA'yê dimeşîne.

Di vî bûyerê de jî tê dîtî ku dagirker li hemû deveran wekî hev in. Kujer (qatil) jî ne li derveyî vî rastiye ne. Tiştên herî balkêş, kujer jî tîmên taybet in û axaftina wan dişibe gotinên Ayhan Çarkın, Oğuz Yorulmaz, Ercan Ersoy û


hwd. Her wiha Midûrê polîsan; Ibrahim Şahin, Deniz Gökçetin, Sedat Demir tîne bîra mirov. Berpîrsê vî oporesyonê yê vîşarî kesekî bênav e mîna Abdullah Çatlı. Senator O'Neil cihê Mehmet Ağar, Margraet Teacher jî cihê Tansu Çillerê digire. Her wiha PKK jî dikeve şûna IRA'yê. Herêma jî êdî ji kesî re ne veşarî ye.

Dawiya film bi vî gotina Mrs. Casmin, "Ev der Şîliyê tîne bîra min" û gotina ajanê MI-5'ê James Miller, "Ev mijar wekî pîvazê ye; çend kaçilan (qafik) ku ji ser rakî, divê ew qas car tu bigirî" diqede.

DÜZGÜN DENİZ

TÎŞK

LERZAN JANDİL



Dem amo

Angorê bawariya min, ziwan (zon) ayneyê mentalîtaya şexsiyet û şarîti ya, ayneyê çerçewe û kalîte ya, ebi ê ziwani fikirîyen o. Naye rê jî ganî mordem dîroka xo, fikr û bawariya xo, her çî ra jî ver xo ebi ziwane xo binivisno. Kirmancî de na kêmasiye biye û her çîqa ke gelê roşnabîran na der heq de berhemî dê jî, na kêmasiye huna jî esta.

La belê, ez bawer kena ebi pirtûkê Mehmet Gülmezi na kêmasiye hem tayîna biya kêmi, hem jî gamê de newiya ke şîkîna ma rê bibo rayber.

Mehmet Gülmezî yew pirtûk nivisno. Nameyê pirtûkî "Dêrsim ra ve Dare Estene- Seyit Riza" wo. No pirtûk hetê Zed Yayın ra serra 1996 aşma desûyewîne de amo çapkerdene.

M. Gülmez Dêrsim de gêro (cêro), kalanê Dêrsim de qese kerdo. Nînan ra birayê cênîya Sey Rizay, Ana Bese, Hemedê Boxî, Sey Riza nêzdî ra nas kerdo. Der heqê Sey Rizay de, zafêrî jî aşmanê dê yê peyênan ser ro zanîstênê xo vatê.

Se ke M. Gülmez jî vano, na der heq de tengasiye zaf a, ke mordemê ma, ma ebi ziwane ma binivisnê.

La belê mordem ke cat bikero, rayê nê rayê vînenê. Na ca jî Munzur Çem hetê nivîskarî keno û nê pirtûkî ebi kirmancî nivîsneno. Na bes a? Nê, na teyna xo ser bes niya. Çimke naye ra dime çapkerdene êna. Se ke mordem nê pirtûkî de jî vînenê, mîzampaj û raştivîsnayane de gumra xetay û kemasi estê. Çinayî re? Çimke çapxaneyî nê karî, nê zaravî nêzanê, yan jî qedr nêdanê karanê niyanêna. Na jî, ti vana qey qeder o! Hurêndiya "Sey Rizay" de "Seyit Riza", "Alîşêr" de "Alîşir", "hokmat" de "hokamî" amo nivîsnayene. Ganî mordem karanê xo ebi cidîyet bicêro xo dest. Cidîyet girêdayê qedrî yo. Mordemkî ke qedr da çiyê, bêguman ê çiyê cidî jî gêno. Naye rê jî çapxanî, kesê ke nê karî kenê, yan jî na cayan gurîne ganî îndî bifikirê, ke çîqa qij bê jî, xetayê niyanêni rind niyê. Gere no qeder bêro vurnayene.

Pirtûkê M. Gülmezî de çiyê gelê newiyê estê. Ganî her kirmanc nê pirtûkî biwano. Ganî nivîskarê kirmancan îndî dest bikerê ci, karanê xo, kedanê xo ebi ziwane xo, ebi ziwane şarê ma, şarê ma nesnê. Îndî dem amo, naye ra tepiya berhemanê xo ebi ziwane xo bidêrê. Seba na gama verêne, seba karêde niyanêni ez M. Gülmez û M. Çemî pîroz kena û ci re serfiraziye wazena û nê pirtûkî zê yew silaynayene (davetîye) vînenê, bawar û hevîye kena, ke roşnabîran ma cewabê na silaynayene bidêrê.

Melîk çawa bû şervan?

Ji her rojê bêhtir bi kêf û bi coş bû, ji ber ku sibê gundî tev diçûn waran. Melîk ji hêlekê ve alîkariya dayîka xwe dikir û ji hêlekê ve ketibû nav xeyalên xweş. Dizanibû ku heval li çiyê dijîn. Dema ku mal bar bikin herin waran, wê hîn bêhtir nêzîkî hevalan bibin û kî dizane, belkî rojekê heval werin warê wan jî. Her ku wisa difikirî ji şadbûna nikaribû di cihê xwe de bisekine. Hemû gundî sibê zû hîn tîrêjên rojê nedabûn der, hişyar bûbûn û dest bi kar û barên xwe kiribûn. Nivîn, cil, firaq û zarok li erebeyan bar kiribûn. Jin û hinek mêr li hespan siwar bûbûn û koç bi rê ketibû.

Melîk li pişt diya xwe siwar bûbû. Hespê wan hespekî rewan bû û deşt û pal ji bo wî yek bûn. Melîk êdî hew dikarî xwe bigire û ji dayîka xwe pirsî:

–Dayê, dibe ku heval derkevin ser riya me.

–Dayê qurban, nizamim. Ma ku derkevin tuyê çibikî?

Melîk hinekî fikirî, tiştê wî yê herî girîng çî hebû ku ew bide hevalan. Hat bîra wî ku dayîka wî jê re katek çêkiribû û hundirê wê bi mortexe tijî kiribû.

–Ezê kata xwe bidim wan. Ma kî dizane, belkî birçî bin.

Diya wî keniya.

–Kurê min pir biazîle. Rast e, divê em tiştên herî xweş bidin hevalan.

Melîk bi çar çavan li der û dora xwe dinêrî, dibe ku heval ji nişka ve di ber wan re derkevin, wî dixwest ku berî her kesî ew hevalan bibîne. Dengê totkanê erebeyan wekî melodiyekê bû, gundî hinekî bêdeng bûn, hinek di nav xwe de diaxivîn. Muxtar li rexekî koç li ser hespê xwe siwar, pir bi diqet dimeşîya. Li herêmê, çûyîna waran ji aliyê dewleta tirk ve hatibû qedexekirin. Serleşkerê qereqola nêzîkî gundê wan, carekê ji muxtar re gotibû:

–Heke ez pê bihesim ku terorîst hatibin gundê we, ezê çûyîna waran li we qedexe bikim û ezê gundê we bişewitînim.

Lê dema ku kurê muxtar şehîd ketibû, ew bi xwe çûbû cem hevalan û fikra xwe ya alîkariyê ji hevalan re gotibû. Ji wê rojê û pê de, yek caran heval dihatin gundê wan. Li gund xayînek hebû û dibe ku wî bi nehênî xeber gi-handibe serleşkerê qereqolê. Tirsa muxtar, ne ku hatina dijmin bû û gundî jî bi dil û can girêdayî hevalan bûn, ji bilî yê xayîn. Lê leşkerê tirkan yek caran êrîş dibirin ser gundiyan û ew dikuştin û dixistin stûyê hevalan. Rojnameyên tirkan di manşetên xwe de digotin: “Terorîstan êrîşî ser filan gundî kirine û li wî gundî tevkuştinî pêk anîne.”

Derdor pir xweş bû. Bêhna gul û kufilkan, dengê çivikan û ronahiya tîrêjên rojê mirov pir kêfxweş dikir. Li

ser ava kaniya sar bêhnek vedan. Melîk derket ser zinarekî mezin û li derdora xwe nihêrî. Çiya çî xweş li dû hev rêz bûbûn. Li navbera wan geliyên şîn wekî ku bi destan hatibin xêzkirin, hatibûn xemilandin. Cih bi cih komên daran û çemên avên zelal li ser sînga çiyân diherikîn ber bi mêrg û zeviyan. Melîk dest bi hejmartina gund û navçeyên ku dixuyin kir. Heya bîstan hejmart, ji ber ku ji hejmara bîstan û wê de hew dizanî bihejmêre, sekinibû. Hinek gundiyan govend girtibûn û dengvedana wan li nav geliyan pêl dida. Dît ku ji nav daran erebe û komek mirov ber bi wan ve tîn, ji cihê xwe rabû û ber bi dayîka xwe baz da.

–Dayê dayê, leşkerên tirkan tîn.

Gundiyan di cih de govenda xwe berdan. Muxtar jî ew dîtibûn, zivirî ser gundiyan:

–Kesek kê m zêde bi wan re neaxivin.

Melîk dîsa li terkiya diya xwe suwar bû û hinekî tirsiyabû. Dizanibû ku leşkerên tirkan dîn û har in û bêwîjdan in. Hingî ku gerîla hatibûn wê herêmê dewletê riyên waran bi dozerê çêkiribûn da ku tanq û jîp derkevin serê çiyân. Leşker hatin gihiştin wan û derdorên gundiyan girtin. Serleşker bangî muxtar kir.

–Were vira. Min ji te re negotibû, heger terorîst werin gundê we, ezê we bikujim?

Muxtar li gundiyan nihêrî û paşê li Silo mêze kir. Dihat zanîn ku xayînek gund ew e.

–Terorîst nehatine gund.

Serleşker bi pehîn û kulman li muxtar da û ew di erdê re kir. Bangî Silo kir,

–Were vira.

Silo çû cem, got:

–Kerem bike serleşkerê min.

Hemû gundiyan bi gir û rik lê nihêrîn. Silo dest bixafîtinê kir. Heval çû ne mala kê, kê çî daye wan û çî hatiye axaftin yek bi yek gotin. Serleşker zivirî ser gundiyan:

–Hûn nan didin terorîstan ha...

Destê xwe hejand û leşkeran muxtar girtin, ew birin ber zinarekî û li ber çavê gundiyan ew gulebarankirin. Jin û zarokên muxtar bi hawar û gazî xwe avêtin ser termê wî. Serleşker îşaret da, leşkeran ew jî gulebarankirin. Gundiyan pêk ve êrîşî leşkeran kirin, lê leşkeran berê çekên xwe dane gundiyan. Ew der bûbû wekî mehşerê ji dengê guleyan. Hawar û gaziya jinan, qijîniya zarokan kezeba mirovan diheland.

Zînê û Sertîf zarok li aliyekî kom kirin, leşkeran hîn jî ew gulebaran dikirin. Piraniya gundiyan bêdeng bûbûn. Xayînek Silo jî di cihê xwe de sar bûbû û bawer nedikir ku leşker ew qas har û dîn in. Bîst gundî hatibûn kuştin û gelek jî birîndar bibûn. Ên ku nemiribûn bêzar mabûn. Serleşker ew kom kirin;

–Kesek ji we ve bûyerê li derekê bi axive, an careke din alîkariya terorîstan bike, îcar ezê we hemûyan bikujim.

Diya muxtar şêst salî bû. Ji nişka ve rabû û bi hemû kerba xwe êrîşî serleşker kir, lê leşkerek derket pêşîya wê, diya muxtar hetanî ku jê hat kêra di destê xwe de di ser sînga leşker de daçikand. Leşker bêcan li erdê dirêj bû. Serleşker jî bi çeka xwe diya muxtar gulebaran kir. Leşkeran Silo girtin û çûn.

Melîk tiştê ku dîtibû bawer nedikir, digot belkî xeyal e. Ji bin goniyan derket hat ser kuştîyan, li diya xwe digeriya. Hemû zarok bi zarezar digiriyan lê Melîk nedigiriya. Kîna di dilê wî de bi qasî dinyayekê bû.

Du roj bi şûn de rojnameyên tirkan nivîsibûn: “Terorîstan êrîşî ser gundiyan ku diçûn waran kirine û bîst û yek kes ji gundiyan kuştine û zêdeyî panzdeh kesan jî birîndar kirine.”

Ji wê rojê û bi şûn de hinek ji gundiyan wî gundî tevî hevalan bûn, hinek ji wan jî ber bi metropolan ve hatin koçberkirin. Deh sal bi şûn de Melîk bûbû şervanekî ciwan û jîrek û li wê herêmê şer dikir.

Rojnameyên tirkan jî dinivîstî, “Îcar jî yê terorîst bi tabûran êrîşî ser qereqolan dikin û wan jî holê radikin.”

ROTÎNDA YETKÎNER



Ji NÇM'ê du kasetên berkeftî

Di kasete "Em hatin" de navên gotinnivîs û awazjenê strana 'Ey heval rêka me dûr e' nehatine destnîşankirin. Temet ku tê zanîn, heger kesên hunermend hişyarî vê yekê bin, wê gelekî baş be.

Di van rojên rabûrî de, ji layê Navenda Çanda Mezopotamaya Jorîn ve, wekî diyariya sersala 1997'an, du kasetên berbiçav "Em Hatin" û "Her Biji-Xortekî Ciwan im" derketin bazara hunerî ya kurdî. Ev kaset her du ji berhemên du hunermendên kurd in ku niha li Ewrûpayê dijîn.

Em Hatin

Yek ji van kasetan a bi navê 'Em Hatin' e ku ji dengê Şehrîbana Kurdî hatiye tomarkirin. Ev kaset ji deh stranên kevn û nû yên welatperwerî pêk hatiye. Ev kaset jî, wekî hemû kasetên dîtirî yên Şehrîbana Kurdî bi dengê şîrîn û bi awazine sivik hatine xemilandin. Bi kurtayî ev kaset jî, mîna kasetên dîtirî Şehrîbana Kurdî bi dilekî xweş tê guhdarîkirin.

Şehrîbana Kurdî, digel hinek stranên nû, hinek stranên kevn ên mîna 'Dayê rebenê' û 'Ey heval rêka me dûr e' di vê kasete xwe de xwendine.

Her çend di vê kasetê de navên gotinnivîs û awazjenên stranên hatine nivîsîn jî, lê mixabin ku navên gotinnivîs û awazjenê strana 'Ey heval rêka me dûr e' nehatine destnîşankirin. Temet ku tê zanîn, heger kesên hunermend hişyarî vê yekê bin, ango kes mafê kesî winda neke, wê

Belê diviyabû ku navê gotinnivîs û awazjenê vê stranê ji layê NÇM'ê ve hatibûya peyda kirin.

Her biji- Xortekî ciwan im

Du wemîn kasete ku bi navê 'Her biji û Xortekî Ciwan im' bi alîkariya mûzîkjenên

Heger hunermendê hêja Dilovan digel hevalên xwe yên sazband, li ser afirandina opera kurdî bixebitin, di baweriya min de wê di kar û barekî wisa de karibin bi ser bikevin.

hêja Dilovan hatiye tomarkirin.

Di vê kasetê de tiştê ku bala min kişand, digel hebûna gelek amûrên mûzîkî, dengê hunermend Dilovan bû. Bi rastî jî, ji dengên ku hefta niha min bihîstine cuda, dengê pir nerm û bi hêz e. Ez dixwazim bi kurtayî nerîna xwe ya der barê dengê Dilovan de wisa bidim xuyakirin: Heger hunermendê hêja Dilovan digel hevalên xwe yên sazband, li ser afirandina opera kurdî bixebitin, di baweriya min de wê di kar û barekî wisa de karibin bi ser bikevin û berhemeke berkeftî bidin.

Ev kasete Dilovan ya ku ji 13 stranên şoreşgerî, welatperwerî û evîni pêk hatiye, ji aliyê bikaranîna amûrên mûzîkî ve gelekî dewlemend e. Di vê kasetê de, digel dengê zelal î Dilovan, amûrên mûzîkî ên wekî.

Tembûr, bilûr, bendîr, qanûn, mey, zîrne, gîtar û gelek amûrên dîtir hatine bikaranîn. Wekî encam mirov dikare bi hêje NÇM'ê diyariyeke baş pêşkêşî gelê kurd kiriye.

DILDAR ŞEKO



gelekî baş be.

w e k î

Frank, Memo, Metîn, Cebraîl, Kalîn, Merdan, Ergîn, Doğan Örs û hunermendên mîna Xelîl Xemgîn, H. Sefkan, Delîl, Zarîfe û Bêrivan, ji dengê hunermendê

Digel strana 'Dayê rebenê' ev strana navbirî jî, berî sala 1970'yî, yekemîn car bi awaz û dengê hunermendê hêja Mahmûd Ezîz hatiye xwendin.

Kobanê

DILBIXWÎN DARA



Ev çend hefte ne ku em ji rojnameya Azadiya Welat mehrûm in. Di van rojên derbasbûyî de wekî ku me tiştêkî xwe winda kiribe. Aman... hevalino; em xwe ji xwarin û vexwarinê mehrûm bikin, lê hema em xwe ji Azadiya Welat bêpar nehêlin. Di hejmarê 47 a rojnameyê de, ez li nivîseke Jan Dost rast hatim. Di vê nivîsa xwe de Jan Dost wekî her carê dilê xwe diavêje ser rûpelê û dest pê dike.

Li vê derê ez naxwazim bi firehî li ser naveroka nivîsê nivîsekê binivîsim. Lê belê, wê nivîsê zaroktiya min anî bîra min.

Kobanê. Belkî wekî Amedê baş nayê naskirin. Belkî wekî Wanê pir ne ciwan û bedew be. Belkî wekî Efrînê ne bi dar û ber be. Lê hema li ser sînor, dilekî birîndar û êşeke giran e.

Min ji bo ku pesnê Kobanê bidim dest neavêtiye pênûsê. Belkî di dilê min de, ev bajar ji hemû rengên pesndanê jî mezintir be. Wekî hemû bajarên Kurdistanê yên din.

Eşkere were gotin, nivîsa Jan Dost ez pir eşandim. Wekî ku wî dilê min bi tîlên li ser sînorê Kobanê girê dabîn. Çi bibêjim? Mirov dikare ji bo Kobanê nivîseke çawa binivîsîne?

Wekî Jan Dost, ez jî wî bajarî nas dikim. Li wir min û Jan Dost bi hev re, me gelek roj derbas kirin. Ev pir ne pêwîst e. Lê belê ya pêwîst ew e ku, mirov ji bajarê xwe hez bike û xwedî li nexweşiyên wê jî derkeve.

Jan Dost şaîrek e. Dilê şaîran, dilekî tenik û bi êş e. Dilê şaîran wekî gulan e. Her demê mirov dixwaze wan bêhn bike û jê hez bike.

Xwezî Jan wekî şaîrekî ev nivîs binivîsanda. Wê baştir bûya. Xwezî wekî şaîrekî Kobanê bida ber dilê xwe. Çiqas baş dibû? Mixabin, dema ku mirov vê nivîsê dixwîne, pê dihesa ku, êdî tu derên vî bajarî nemanê ku mirov jê hez bike. Gelo, wisa ye? Tu cihên Kobanê tune ne ku tu jê hez bikî Jan?

Ez bawer nakim ku wisa be. Mirov dikare pir ji Kobanê hez bike. Wekî ku tu ji Amedê hez dikî, lazim e tu ji Kobanê jî hez bikî. Ji ber ku, bajarekî me ye, parçeyekî welatê me ye. Hemû kevir û kuç bin jî, hemû kerbela be jî, darek lê tune be jî, hemû çemên wê miçiqîbin jî, dîsa em mecbûr in jê hez bikin, ji ber ku li ser wê axê diya me nav li me kir. Li ser wê axê me çavên xwê vekirin û li ser wan sînoran me hevalên xwe yên ku em pir ji wan hez bikin, şehîd dan...

Baş e, Jan Dost, ji bîr neke ku tu ji axa vî bajarî çêbûyî, wê demê zimanê te çawa digere ku tu bibêjî: "Ev ne tu bajar e û ne layîqî stranên e...?"



Rûnê nivîşk û Mele Elî

Beriya şerê Rizgariyê li Kurdistanê gelêk melayên mêjok û sextekar hebûn. Li ser navê dîn gelê me di-xapandin û keda wan ji xwe re dikirin bingeha jiya-neke bêxebat.

Yek ji wan melayên xêrnexwaz jî, Mele Elî bû. Mele Elî wê havîncê diisa diçe ser bêderên gundiyan û ji gundiyan zekate dixwaze. Lê gundiye reben Xelilê Cefo wê salê ji bilî qûtê salê tu tişt hilnedaniye. Stûyê xwe xwar dike û ji Mele Elî re dibêje:

– Seyda, tu dizanî ku îsal ji min re tu tiştêk nehate. Ez vî zadî zekate bidim te, ewê zarokên min tevde birçî û belengaz bimînin. Lê çend qor bizinên min hene, me ji wan hinek rûnê nivîşk hildabû. Heger tu qebûl biki, ezê rûn bidim te.

Mele Elî bi xwe dizane ku, jê re rûn çêtir e. Lê belê, naxwaze xwe pê re sivik bike û wiha dibêje:

– Ka ezê bifikirim. Heger ku di bin de cihê vê yekê hebe, ezê bigirim. Sibê ji Xelil re tiştêkî wisa bêje, ku hem qedrê xwe pê zêde bike û hem jî rûnê xwe yê nivîşk bistîne.

Plana çêdike. Her wiha tiştêkî li hev tîne jî. Dora rojê Xelilê Cefo tê mala mele.

– Seyda te çawa kir? Gelo te ji bo me tiştêk dît, an na? Mele lê vedigerîne:

– Belê Xelil, ez pir fikirîm. Hetanî sibehê ketim tefekûrê. Min ne Îmamê Gazalî hişt û ne jî Îmamê Buharî.. Lê min di dawiyê de dît.

– De ka bêje Seyda. Ez qurban, te çi dît? Mele xwe qure dike û bersivê dide Xelilê Reben:

– Di hefîsa Hezretî Pêxember de wiha dibêje: “Qale we qûle, ceh û genim tune be ji mele re rûndayîn meqûl e.”

GURCÎN SÎPAN

Şorlûp

Mirovek hebûye, gelek pereyên dewletê xwaribûye û deynê xwe jî tu carî nedaye. Ji ber vê yekê, dewletê ew xistiye girtîgehê. Mirovê girtî jî, ji bo parastina xwe parêzerêkî (ebûqatekî) ji xwe re digire. Parêzer jî wî mirovî re dibêje:

– Ezê te xelas bikim, lê belê pêwîst e ku tu jî sed wêreqeyî bidî min.

Mirovê girtî di cih de qebûl dike. Parêzer jê re wiha dibêje:

– Gava hakim ji te çi bipirse, tu bêje şorlûp.

Ê girtî qebûl dike. Roja mehkemeya wî tê û bangî girtî dikin. Li dadîgehê dibêjin:

– Navê te çi ye? Girtî dibêje: “Şorlûp.”

Navê bav û diya te çi ye? Dîsa bersiv dide: “Şarlop.”

Te çima pere neda? – Şarlop.


Bêhna hakim gelekî teng dibe. Parêzer jî di wê demê de ji hakim re dibêje:

– Ev mirov dîn e, divê tu wî berdî... Hakim jî, ji ber ku çareke din wî nebûne, qebûl dike û girtî berdide. Gava girtî ji hepsê dertê derva, parêzer xwe digihîne ba wî û sed wêreqeyê xwe dixwaze. Lê girtî di bin simbelê xwe re dikene û bi qurnazî dibêje:

– Welê û bileh te ji min re got bêje ‘şorlûp’, ji ber vê jî, pereyên te jî bûne şorlûp.

MUHEMMED MUHEMMED

BIXELAT... XAÇEPIRSA BIXELAT (52) XAÇEPIRSA



Bersiva Xaçepirsa 49'an

Xaçepirsa me bixelat e. Di 15 rojan de çi bersiv bigihîjin me, emê wan binirxînin û bi rîya pişkê li 5 kesan belav bikin. Xelata hejmara me ya 52'an pirtûka “KEVOKA SPI” ya Fîrat Cewerî ye.

Jêrenot:

Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn “Peyva Veşarî” di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî adresa xwe ji me re bişînin.

Baban
Botan
Soran

Pênc kesên ku xelata xaçepirsa hejmara 50'an, pirtûka ALBERT CAMUS “Biyarî” qezenc kirine: M. K. Demîr/ Entab. Aydın Topal/ Îskenderun. Seydo Basmacı/ Ruha. Cemîl Bilgiç/ Edirne. Ozan Kelekçi/ Kartal

Lêkolînerê kurd (wêne)	Fêkîyek	Ciwan	Oksijen	Notayek	Notayek
Malxwey	Sembola zirkonyûm	Zindibûn	Gel. xelq	Saziyeke îstatistîkê yê tirk	
				Sala borî Sembola Mendelevyûmê	
Sembola îridyûmê		Nehoste			Xwarina me ya bingehîn
Paşgîrek		Genimê hêrandî	1		
	4	Şofêr			Bi almanî “erê”
		Dîni			
Rabirdû					
Dert. elem	2		Bazar	Deng	6
				Xwedbirî	
		Îfîtra			
		Yezdanekî Mîsri			Bersiva neyînî
Enstrûma neke antik			Bexçeyê tiri		
Gihanekek			Sebzeyek		
		Gopal		5	Sembola Osmiyûmê
		Paşgîrek			
Bênk					
Gihanekek	3		Sebzeyek		
		Cihê ku tavê nabîne			

PEYVA VEŞARÎ





Rojnameya Hefteyî
(Haftalık Gazete)

Li ser navê
Zerya Basın ve
Yayınçılık
San. Tic. Ltd. Şti.
(adına)
Xwedî (Sahibi)
CELALETTİN
YÖYLER

NAVNÎŞAN
Ayhan Işık Sk. No:23/3
Beyoğlu / İSTANBUL
TEL-FAX
(0 212)
251 90 13

Gerînendeyê Weşanê
(Yayın Yönetmeni)
SAMİ TAN

Berpîrsê Karên
Nivîsaran
(Yazı İşleri Müdürü)
DÜZGÜN DENİZ

Berpîrsê Saziyê
(Müessese Müdürü)
TAHİR ELDİMİR

ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık
A.Ş.

BELAVKIRIN
BİRYAY Dağıtım

NÜNERİTİYÊN ME
(Temsilciliklerimiz)
Nimînendeyê Giştî
yê Ewrûpayê:
Mazhar Günbat
Suriye: Jan Dost
Helîm Yûsîv

Berlin:
Silêman Sîdo
49-30-69002695

Hannover:
Selîm Biçûk
49-5721-81360

Munchen:
Mahmut Gergerli
49-871-670884

Bruksel:
Medenî Ferho
32-02-466037

Stockholm:
Robin Rewşen
46-8-7510564

Bonn:
Ahmet Baraçkılıç
49 228 66 62 49

Celle:
Wezir Saçık
49 50 52 87 36

Dewleta çetî û rojevê sextey

ROBÎN REWŞEN

Girotişê şêxî, kiştoxê Özdemir Sabancı, tehdîtkerdişê Kibrîs û Yewnanistanî, vînayîşê laşê Vehbî Koçî; enî heme tê dir û wextêke de benê, loma zî enî heme tesadûfî niyê. Yan zî tesadûfê plankerde yê.

jev bidelno û qezay Susurlukî rojev ra veco.

- Laîk û kemalistê ku dewlete ra dîr ketî bî ancî biyaro xwi het.

- Pesna propagandayê misilmanî binê kontrolê xwi bikero û misilmanî teberê kontrolê xwi xirab bimocnora.

- Bi eno hawa Partî Refahî qels û zêife kero ku zêdetir biko binê emr û kontrolê cengê taybetî.

- Û di çay munaqesane çetefî dewlete de, milete bianço miyanê munaqesey laîk û antî-laîkî.

Bi qey vîrakerdişê çetefî dewlete girotişê şêxî û ceneke qîm nêkerd, enarey ew merdimo ku vanê Özdemir Sabancı kuştî bi helaheleyêka pîle, televîzyon û rojnaman de vet, serokwezîr û wezîrî kewtî dewre hergû joyî hetêke ro serkewtîş û xurtî dewlete îlan kerd ku meydan de serkewtîş zî çinêbî, ew merdim bi xwi partî xwi ra rêmîabî û teslîm bîbî. Bi enî zî nêvindertî û vat: "Ew merdim yanê gorey vaîşê înan kiştoxê Özdemir Sabancı şîyo Yewnanistan ewca ra zî şîyo Sûriya. Goya înan zî ew Sûriya de giroto bêxêberay muxaberatê Sûriya ew ardo Tirkîya. Bi eno hawa zî wazenê enî mesajî bidê ku xwi ra Yewnanistan û Sûriya neyar ê, gerek jo qal û behsê zetan û zetefî dewlete nêkero, enî munaqesey zirar danê dewletê.

Hema rojev nêbîbî şenik; xwi ra gorey heşab û waştîşê înan ra gerek rojev qet nêbo şenik, belay xwi sawite Kibrîs ra, Kibrîs tehdîd kerd, vat: "Ma go to ro din (wa do to ra), dewrê to bigirin, Kibrîs heme îşgal bikerin. Kibrîs tene nê, Yewnanistanî zî barey xwi enî tehdîtan ra giroto. Ew perçeyê Kibrîsî ku dewleta tirkê îşgal kerd, biyo meydanê çetan, bazirganî eroînî û bankanê perey eroînî.

Serokwezîr Erbakanî Yewnanistan tehdît kerd û vat: "Wa Yewnanistan baniyo tarîx ra. Tecrûbey înan estê û zanê ma go se kerin."

Yanê Erbakan wazeno vaco ma go zey verî şîma bikîşin, qir bikerin, talan bikerin. Wezîrê bîni zî Erbakanî re cêr nêmendî û înan zî tehdîtê xwi kerdî. Hema çende aşmî verî Kibrîs de, faşîstê ku Tirkîya ra şîbî û eşkerê ku

kibrîs de yê tê dir di xortê rûmî kiştî û hema guney bînan nêbiya ziwa dewleta çetî qalê kiştîş û qetlîmanan kena.

Ti vanê qey pîlê ena dewleta kontra hema Asya Miyanîne de, esparê estoran û şîmşêr di dest de seran permenê û ra dimay talanî yê. Yanê kultur û medeniyetê ena dinya newî ra barey xwe nêgirota.

Edeb, exlaq û normê diplomasî estê. Yanê çî bêro fekî merdimê, merdim neşkeno vaco. Ziwan û uslûbê diplomasî ziwan û uslûbê nermî û nezaketî yo. La ti hanênê pîmaê dewleta çetî ra ziwan û uslûbê înan zey ziwan û uslûbê veradayanê kuçanê Diyarbekirî yo.

Meydan de çike zî çiniyo. Kibrîsê rebenî waştî xwi rê çende fuzan (moşekan) Rûsya ra bigîro û hema bazar kenê yanê hema fuzey niyaney girotişê. Dewleta kontra qiyame kerdara, bî har e. Bazarê fuzan zî enka nê, rewêna ra dest pê kerdîbî.

Şîma zanê ena dewleta Amerika ra, Rûsya ra, hema dewletanê Ewrûpa ra heta Pakistan û Şîlî ra silehan hêna jo nêvano çike û jo tehdît nêkeno. Çirê xwi darenave û dana erd ro. Dewlete bi eno hawa wazena verê şarî bido teber, şovenîzm zêde bikero, Kurdistan de, Licey de zilm û qetlîmananê xwi dewam bikero û çetefî xwi bilimno.

Girotişê şêxî û ceneke, kiştoxê Özdemir Sabancı, tehdîtkerdişê Kibrîs û Yewnanistanî, vînayîşê laşê Vehbî Koçî; enî heme tê dir û wextêke de benê, loma zî enî heme tesadûfî niyê. Yan zî tesadûfê plankerde yê.

Dewleta çetî hemberê cengê gerîlayî, cengê azadî kewta tengî û krîz û wazena bi rojevvanê sextan çetefî, pîsîfî û sîcanê xwi şarî ra bilimno. La ti çiya ro baniyê sîc û pîsîfî biloq kenê û îmkanê jimitîşî nêmendî.

Ew perêno ku dewlete daw xwi ra û wazena pê sîcan û çetefî xwi bilimno, bi perodayîşê gerîlayî heme qule biyo, pûya wo û cê ra şîyo. Eno perêno puyaye hendî pîne nêbeno. Qulêke pîne kenê, des gulê bîni bîne a Ma go banî û temaşe bierin, hela eno rejîmê cengê taybetî bi enî perênê puyayî go çîqa xwi ver bidî.

Serê qezay Susurlukê de zehf hame vindeştişî, zehf çî hamey vaîşî. Qezay Susurlukî perde û perênê serê dewlete dariwe, sîc û fiêlê dewlete heme veciyay meydan, eşkera biyî, çimê korî û goşî kerî bî a. Kontrafî û çetefî dewlete zey tîcey amnanî be-reqênê û hendî jo neşkeno înkâr bikero û bilimno. Bi qey şarê ma yê Kurdistanî eno çîkewo ecêp û limite nêbî. Çimkî pêşengî muca-deley Kurdistanî bi teorî û siyasetê xwi çetefî û kontrafî ena dewlete dest nîşan kerdîbî, eşkera kerdîbî. Şarê ma zî bi seran ku roc bi roc ena kontrafî û çetefî û bi çimanê xwi û bi jiyaney xwi ya rojane vînenî. Ena çetefî şarê ma ser ro bena. Xwi ra dewlete zî Kurdistan de eşkera çetefî kena û hewce nêvînenî ku bilimno. Eno 77 serî yo ku ena dewlete Kurdistan de şarê ma ser ro çetefî kena.

La qezay Susurlukî çimê henînan kerdî a, înanî ku veng nêberdene xwi veng şî înan. Dewlete serê qazay ra heta enka zehf xebatiya, zehf zor da xwi ku çetefî û puyayîşê dewlete bilimno, dewlete ena gendelî û pîsîfî ra şak kero, emî sîcan bikero çende kesan ser û xwi te ra bixelesno. Xwi ra televîzyon û rojnamey emr û fermanê dewlete û genelkurmay de yê. Dewlete senîn biwazo televîzyon û rojnamey zî bi eşqê kewo pîl xizmet û wazîfey xwi kenê. Şarî xapênênê û manipûle kenê. Bi enî rojevane sexte û pûçan emrê xwi û îqtidarê xwi kenê derg. Gerek ma qebûl bikerin ku rejîmê cengê taybetî enî hetî de wahîrê tecrûbî yo. Vanê osmaniyan heta kay, dek û dolabî zehf ê. Ena dewleta çetî înan ra tepiya mameña? Nê. Heta înan ra kerdî zêde, ravêra wa. Ma hemîna tê dir hunerê rejîmê cengê taybetî dir.

Şêxeke cenekeke dir hame girotişî, hedî heme televîzyon û rojnaman behsê şêxî û ceneke kerd û bi eno hawa dewlete waşt-perdeyêke bianco şerê çetan û çetefî dewlete û verê çiman ra bilimno. Eşkayênê şêxî verî zî merdimeke wo eger sîcê cê esto zey heme sîcda-ran vecê verê mehkema. Hewce nêkerdine endêke biweremne û pîlê-kerê. Şêx bî qurbanî siyasetê cengê taybetî.

Enî rejîmî çendê hetan ro girotişî şêxî ra waşt îstîfade bikero û henêke zî zer kewt.

- Rejîmî bigirotişê şêxî û ceneke waşt ro-

Bêyî çeteyan şerê

qirêjî nameşe!

Di xwepêşdanê de hate diyarkirin ku, yên vî welatî ji vê rewşa giran xeles bikin jî, karkerên tirk û kurd in. Wan bi vê sloganê rewş diyar kirin: "Ev welat yê me ye, em pergaleke bê-eşîret û bêfaîlî meçhûl dixwazin."

Li aliyê din girseya HADEP'ê bi pankartan bal kişandin ser rewşa kampa Etrûsê û kirinên dewletê yên li Licê.

Roja 19'ê rêbendanê li Stenbolê, li Meydana Abide-i Hürriyetê ji bo eşkerekirina çeteyan ji aliyê SİP, HADEP û hin saziyên sivil ve xwepêşdanek hate lidarxistin. Li dora 20 hezarî mirov beşdarî vê çalakiyê bûn. Di xwepêşdanê de Doç. Dr. Haluk Gerger, Serokê SİP'ê Aydemir Güler û Sekreterê Rêxistina HADEP'a Stenbolê Cemal Coşğun axivîn.

Pêşî Haluk Gerger ji bo axaftinê derket pêşberî beşdaran. Gerger di axaftina xwe de bal kişande ser çeteyan û diyar kir ku çeteyan dewlet dorpêç kiriye û wiha got:

"Van çeteyan ev welat kirine wekî komara ceng û kedxweriyê. Ji aliyekî ve bi hêza ku ji pergala nû ya dinyayê û jî efendiyên wê distîne êrîş dikin û ji aliyê din ve jî, ji ber tirsê xwe êrîş dikin. Tirsê wan ew e ku nikarin desthilatiya xwe li ser karkerên kurd û tirk bidomînin."

Gerger li ser şerê qirêjî jî sekini û wiha domand:

"Li dijî gelê kurd şerekî bêwijdan tê meşandin. Neteweya ku neteweyek din biperçiqîne nikare azad be. Bandora şer bi her awayî ve xwe nîşan dide, li aliyekî înfaz, li aliyekî cinayetên faîlî meçhûl û li aliyê din jî di binçavde windakirin, qaçaxçitiya êroîn, esrarê, îşkence û tiştên cur bi cur li vî welatî bi destê dewletê têne kirin. Em li dijî vî şerî ji bo gelê kurd û karkeran aştiyêke bidalet, biheysiyet û birûmet dixwazin. Emê li dijî çeteyan, şerxwazan û mafyayê hetanî dawiyê têkoşîna xwe bidomînin"

Piştî Gerger Serokê SİP'ê Aydemir Güler jî li ser çeteyan tiştên balkêş gotin. Güler wiha peyîvî:

"Vê meseleya çeteyan dixwazin wekî karê polîsan bidin nîşan. Her wiha kapitalîzm bi xwe labîrenta çeteyan e. Li vî welatî berpîrsên emniyetan li îşkencexaneyan digihjin,

wezîr jî li welatê biyan planên darbeyan amade dikin."

Aydemir Güler jî wekî Haluk Gerger diyar kir ku yên vî welatî xeles bikin dîsa karkerên kurd û tirk in. Güler li ser partiya DYP'ê jî ev gotin: "Hetanî niha Süleyman Demirel serokatiya vê partiyê dikir, ew qas qirêjî ji nav DYP'ê derdikevin, lê tu fatûre ji Demirel re dernakeve."

Sekreterê Rêxistina HADEP'a Setenbolê Cemal Coşğun jî axaftinek kir. Coşğun bi giranî li ser têkiliya şer û çeteyan rawestiya Her wiha Coşğun diyar kir ku heta pîrsgirêka kurdî neyê çareserkin, tu gavên demokratîk nayên avêtin û çete jî wê her tim hebin. Coşğun axaftina xwe bi vî awayî berdewam kir:

"Partiya me ji avabûna HEP, DEP û HADEP'ê ta niha ji bo çareserkirina pîrsgirêka kurd û pîrsgirêkên civaka tirk xebat kir û hê jî xebatê dike. Lê partiyên me hatin girtin, 164 hevalên me hatin kuştin, serokê me yê giştî û gelek hevalên me xistin binçav û bêsûc hatine girtin. Ew îro ne di nav me de ne, lê em dîsa li meydana e, ji niha pê ve jî emê li meydana bin."

Di dawiya axaftinan de hate diyarkirin ku, yên vî welatî ji vê rewşa giran xeles bikin jî, karkerên tirk û kurd in. Wan bi vê sloganê rewş diyar kirin: "Ev welat yê me ye, em pergaleke bê-eşîret û bêfaîlî meçhûl dixwazin."

Girseya HADEP'ê jî di xwepêşdanê de bi hin pankartên wekî 'Penaberên Etrûsê ne bi tenê ne', 'Sêgoşeya rûmetê: Etrûs, Lice, Amed' bal kişandin ser rewşa ku kurd tê de dijîn.

Her wiha ji Navenda Çanda Mezopotamyayê Zarokên Gulên Mezrobotan jî bi strana 'Halklar Kardeşdir' beşdarî xwepêşdanê bûn di destên wan de portreyên Mehmet Sincar û Muhsin Melik hebûn.

AZAD ALTUN

